

Gelê KÜRD

gelekî serhildar, têkoşer , mêrxas û qehreman e.  
Heydor Əliyev

# DİPLOMAT

Nº 17 (529) 01-07 May, Gûlan sal. il 2023  
Ji meha şûbatê sala 2003-a tê weşandin

Həftəlik İctimai-siyasi qəzet  
Rojnama heftename civakî û sîyasî

Qiyməti: 40 qəpik  
Hêjaye:

Ser jîyannama û serhata Melle Mistefa Barzanî Weşana bi taybet



Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gênêran Mistefa Barzanî

**Serok Barzanî:  
Kurdên Feylî  
beşeke sereke  
ya gelê  
Kurdistanê ne**



Səh. 7

**Nêçîrvan  
Barzanî  
serdana  
Bexdayê  
dike**




Səh. 9



Səh. 7

Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Komkujiya Kurdên Feylî beşek ji jenosîda gelê Kurdistanê bû



Səh. 7

İdrîs Barzanî di 36emîn salvegera wefata xwe de tê bibîranîn



Səh. 9

Qubad Talebanî: Pişka Herêmê tevlî nekokiyyen siyasî nekin



Səh. 12

Ji Quştepe heta Enfalê û tevkuiyyen bêrawestan!



Səh. 9

Ebdurehman Kurt: Serxwebûna Kurdistanê ji bo hemû kurdan giring e



Səh. 7


Mistefa Hicrî: Dualîbûna referandumu Komara İslamî

# Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzanî

44 sal ji ser wefata Serok û Rêvebirê Gellê Kûrd Gêneral Mela Mistefa Barzanîyê hertim zindî re derbas bû

Piştî Silemaniyê, gunde Barzan dibe navenda xebata sîyasî li başurê Kurdisitanê:

Piştî şikesta şorişa Şex Mahmudê nemir barê xebat û karê Kurdayetîyê li başurê Kurdistanê bi yekcarî dikeve here-ma Behdînan ku navenda rêberatîya vê xebat û heréketa gundê biçuke Barzan e.



Qeza Mêrqaşor ku nahîyen Mêrqaşor, Barzan û Şêrvan digire ber xwe, girêdayî wilayeta Hewlêrê ye.

Devera Berzan berîya kû piştî çend şerhîdanen kurdan bi yekcarî ji alîyê rîjîmîn dagirkir ve wêran bibe, 400 gundûn awedan têda hebune û hejmara runiştvanen heremê zêdetir ji 40 hezar kesan buye. Herema Barzan û navenda wê gundê Barzan di çaxê Şex Ebdulsalamê yekem da ku di sala 1872-ê zayînî de wefat kir, ji ber ku tekeya terîqeta Neqşbîndî li Nehriyê têda bu, mîna navendeke olî û avedan ku herdem tevî mirîdîn ve terîqêtê bu, tihat hesibandin. Şex Ebdulsalamê yekemîn berêvajî şex û axayê hemdemî xwe, mirovîkî dadmend û bi edalet bu. Wek jêderên bîyanî didin xuyakîrin di çaxê wî da hinek karên baş û xebatê sosyalî ji bo pêşketina jîyan û rewşa civakî hatin kirin ku ger bi pîvanê roja iro bêñ nîrxandin û şirovekirin, di wê serdemêde pir girîng bun. Ji wan karan:



parvekirine zevî û erdê çandinê bi ser gundîyan de, qedexekirina milkdarîya zêde bi şeweyîn fêodalî, qedexekirina bi zorê zûdayîna keçan û parastina siruştâ Kurdistanê anku birina dar û dirextan, şewitandina daristana û qedexekirina kuştin teyr û tiwalan, nêçira heyvanêñ kovî, bêhînfireyî li hemberî dîyanetêñ der û dora coxrafiya jîyanâ wan û herema Behdînan (Jîyanâ hevpar bi Kurdenê êzidî, turkmîn, kildanî, yehudî, xaçparêzîn)

erîmeni ê musliman bun û ...) jîyanâ dostanî bi hemu gelêñ heremê re û xala herî girîng parastina mafê gelê kurd û serkeşîya bizava netewîya kurdan di heremek coxrafiya girîngâ Kurdistanê de ku nîşana demokratîkbuna bir û ramanê bireveberen Barzanî bû, tesîrek mezîn li ser bizava sîyasî 10îya vê malbatê danî.

Piştî wefata Şex Ebdulsalamê yekem kurê wî Şex Mihemed Barzanî dibe cîgirê wî. Şex Mihemed piştî zewacê dibe xwenduya pênc kuran: Şex Ebdulsalam, Şex Ehmed, Mistefa Barzanî, Mihemed Sîdîk û Şex Babo. Wan tevan ji desbêka xwenasandinê bu hemu awayan xebat kirin ku rîya kalkê xwe ya xizmeta ji bo gel di hemu warêñ sîyasî, olî û civakî de dibomînîn.

Navdartirîn endamê vê malbatê ku tevaya temenê xwe di rîya xebata sîyasîya jib o kurd û Kurdistanê derbas kir, Mistefa Barzanî ye.

Mistefa Barzanî kîye, cîkirîye û serhîdana wî di dîroka Kurdistanê de xwedî rolekî çawaye?

... Jîyanâ te ji tîjî buyer, derdiberî û niştimanperwarîya Mistefa Barzanî ye heja radeyeke. Bersîva van pîrsen me bide. Jîyanâ nemir Mistefa Barzanî, malbatâ wan û çend buyerên din di jîyanâ wî da. Mistefa Barzanî di 14-ê adara sala 1903-an (14. 03. 1903) de le gundê Barzan hat dinê. Berîya ku ew cavêñ xwe bi jîyanâ dînyayê veke, bavê wî (Şex Mihemed) ji di sala 1903-an de wefat kirib. Li gor çavkanîyê dîrokî her çend nerazîbûn (ittîraz) û bizava Şex Ebdulsalam Barzanîye duyemin li dijî Osmanîyan zêde dewam nekir, clê ev serhîdan û serhîdana din yên mîna serhîdana eşireta Millîyan bi serokatiya İbrahim Paşayê Millî û çend serhîdanen din li heremê cuda bi cudayê Kurdistanê, bun sedemîn xweşkirina zemînêya çebuna şoreşa Îtihadîyan di sala 1908-an de. Çaxe çalakî û lêbatê sîyasîyen Barzanîyan vedigere bo destbêka sedsala XX-an ku bi

gundê Barzan ket ber hêrişâ hêzîn wan yên di bin serokatiya Silêman nezif Paşa

û Iranê bun, dikeve nava tekeliyîn politîk. Mistefa Barzanî ji çaxê li xwe famand, zû




da. Ji ruyê neçarîya Şex Ebdulsalam Barzanî pêna xwe bo Seyîd Tehayê Nehri dibe û di gunde Rajan li herema Mirgever (wilayeta Ûrmîyê - Rojhilatê Kurdistanê) dimîne û bi hevkariya serokê Kurd nemir Simkoyê Şikak bi karbîdesten Rusan re dikeve nava peywendîyen sîyasî, lê mixabin çaxe ku ew li herema Mirgever bû, ji aliye xwefiroşekî bi navê (Sofi Ebdullah) ve bi şeweywk namerdane hat girtin û ew teslimî dewlîta Osmanîyan kirin. Osmanîyan di 14-e çiraya paşîn sala 1914-an de piştî pekanîna dadgehek formaliê, Şex Ebdulsalamê Barzanî li bajare Musilê darda kirin.

Di etmosferek wiha tîjî kîna li hemberî dewletîn dagirkir û zordarîya destgeh û berpirsyarîn hokumeta Osmanî de, Mistefa Barzanî ji mîna İsmail Axayê Şikak, Şex Mehmed Berzençî û gelek serokîn din yên kurd çavêñ xwe bi jîyanekê tîjî êş û elem vedike û di nava malbatêk olî de mezin dibe. Ev rewşa jîyanê pêşeroja jîyan û helwesta sîyasîya wî lîdîrê kurd ji dide destnîşan kirin û ew bîr û ramanê Kurdayetîyê bêtir di hest û mîjîyê xwe de dide perwerdekirin. Piştî ku Osmanîyan bi bêbextî Şex Ebdulsalam Barzanî şehîd kirin, Şex Ehmedê birayê wî bu rîber û serkarê here-ma Barzan û eşireten Barzanî. Wê demê tîmenê Mistefa Barzanî 18 salî bu. Berîya wê li gor çavkanîyê dîrokî di navbera salêñ 1917-a, 18 û 19-an de, Şex Ehmedê Barzanî birayê xwe yê xurt Mistefa Barzanîye 16 salî bi Şex Ebdulrehmanê Şîrnexî rî jib o lidarxistina kar û barê şoreşek berfireh li bakurê Kurdistanê dişîne bajare Muşê û ew li wir hev dîtîneke bi Şex Ebdulqadirê Nehri û Şex Seide Pîran re pêk tîne. Herwiha Şex Ehmed bi şeweyk nîhîni ji sala 1920-an û pêde bi Şex Mehmed Berzençî û Simkoyê Şikak re ku sergermî xebeta li dijî her du dewletîn Îraq

bi bindestî û tepe-serîya gelê kurd hesîya. Wî dixwest bi hevkariya birayê xwe Şex Ehmed, xelekêñ zincîra hereketa kurdî bi rîk û peki bidomîne.

Herwiha Mistefa Barzanî ji temene 15 saliya xwe û pêde bo kar û barê parastina hoza Barzan li dijî desthilatdarîya dewleta navendîya Îraqê û hozîn çiran, roj bi roj wekw şervanekî zîrek erk û wezîfeyen zêdetir li ser milêñ xwe hîss dikirin.

Eşireten kurd bi giştî û eşireten Barzan bi taybetî di tevaya dirêjahîya dîroka xeba-ta sîyasîya xwe de bi wefadâriyek mezin û di tengavîyê herî giran de rîbatê xwe bi tenê nehîstine û bi dilsozî û fedakarî ew parastnîne. Ev rasti di bîranînen wan serşekîren artêsa dewletîn dagirkir de ku bi hêzîn Barzanîyan re ketine nava şerîn



giran ji, tê dîtin. Serşekî Teferuşyan, Hesen Erfeî û Rêzim Axa di pirtukîn xwe de vê rastîyê diselmînin.

(dûmahî rûpêla 3)

# Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzanî

## 44 sal ji ser wefata Serok û Rêvebirê Gellê Kûrd Gêneral Mela Mistefa Barzanîyê hertim zindî re derbas bû

(despêk rûpêla 2)

Sala 1919-an Mistefa Barzanî li ser biryara birayê xwe Şêx Ehmedê Barzanî dema ku xortekî 19 salî bu weke fermandarekî şervan û şareza, bi hêza xwe wê ji bo hevkarîya xebatkarên şoreşa Şêx mehmudê Berzinçî xwe gêhand herema Silêmaniyê. Hêza wî bû du qoli ku halîkarî ji qolla Pîyaw û koma din jî ji navçeya Balek de derbas bun. Ew herçend di rê de rastî şerê bi eşîretên hevkarîn îngîlizan re rast hatin jî, lê bi fidakarîyêk mezîn û şehîtbuna çend şervanê Kurd wan xwe gêhandin herema Silêmaniyê. Mixabin berî ku ew bigêhin wê derê şoreşa Şêx Mehmude Berzençî jî bi dîlî ji Kurdistanê hat dur xistin. Mistefa Barzanî bi ve kiryara xwe da îspatkirin ku pêvista her kes bi şeveyek netewî nêzî pirsgireka gelê xwe bibe.

Kurdistanê (Mihabad 1946) de jî Melle Mistefa Barzanî sînorê destçerîkî bi fermî nas-nekirin û xwe gêhand paytexta komara bajarê Mihabadê. Ev nîşanek ji bo selmandine ve

Lê şerê herî mezîn ku nemir Mistefa Barzanî hertim di jiyana xwe de bi serbilindî û şanazî behs

rêbaratiya şoreşa Kurdan dihat hesibandin, bi giranî hat bom-babarankirin û her çend

tanê dijîn. Kesênu li ser erdningarîyê bedew û rîngin jîyanê derbas bikin, zu bi zu nikarin fêrî



li şer kirîye, şerê bi navê (Dole Vajî an ji Dola Vajîya yê ku di rojîn 3 û 4-ê 02). Şûbatê sala 1931-an de li Dola Vajîya li hemberi artêşa dewleta Îraqe qewimî.

Barzanîyan bi mîranî berxwedan kirin û di destpêkê de hinek serkeftin bi dest xistin lê nikarin li hemberî hêza pircek û cebîlxanê û firokên şer yêng Ingîlizan, li

berxwebidin. Piştî we buyerê Şêx Ehmed û malbatê Barzanîyan neçar man di havîna sala 1932-an de derbasî bakure Kurdistanê bibin. Lêbihara sala 1933-an dewleta Tirkîyê Şêx Ehmedê Barzanî ku wê demê rîberê sîyasî û olîyê hereketê bû, bi çend şervanê wî jî Tirkîyê teslimî dewleta Îraqe kirin. Ji vê tarîxê û pêde di dîroka serhildana Barzanîyan de rûpelê durketin û derbiderîyê vedibe û jîyanek tijî êş û buyer di nava Kurdên başûrê Kurdistanê de dest bêdike. Dema ku

Mistefa Barzanî ev bêbextîya dewleta Tirkîyê dît, ji wir ber bi ciyayên Kurdistanê cu û xwe teslimî dewlwta Îraqê nekir. Lê li ser daxwaza Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî jî xwe gihad cem birayê xwe (Şêx Ehmed) yê ku di girtîgeha bajarê Musilî de bu. Mistefa Barzanî herçend dizanî ku jîyanek tal û nexwê li benda wî ye lê ji ber tewazî û qanûnê malbatî, bi kîfxwesi jîyanâ girdîgehê ji xwe re hilbijart.

Sala 1932-an di çaxê jîyanâ hêşîri û dilketfida Barzanîyan dê, dewleta Îraqe bi rînmûniya axayê xwe yêng Brîtanî Şêx Ehmed, Mistefa Barzanî û malbatê Barzanîyan berê şandin bajarê Musilî û piştre jib bo Nasirî, Kifîr û Pirde (Alton Kopri) û di dawîyê de ji bo Silêmaniyê sîrgun kirin.

Di dawîya bihara sala 1936-an Mistefa Barzanî jî bo gotubêjîn diplomatîk bo bajarê Musilî hat vexwîndin, lê berpirsîyarên dewleta Îraqe li wur Barzanî girtin û bi kiryareke durî exlaqe mirovanatîyê walîyê Musilî ye wê çaxê xwest ku bi dayîna jehrê, wi ji holê rake, lê Mistefa Barzanî piştî du hefteyan ku ketibu hale bêhîşyê, ji mirinê rizgar bu.

axa bav û kalên xwe Kurdistan

partîya Hîwa, Mistefa Barzanî piştî 10 salan derbiderî û jîyanâ hêşîriyê ya di destê karbi desten dewleta Îraqê de, ji bajarê Silêmaniyê bajarê Sînoyê li Rojhilatê Kurdistanê kîrin. Di wan mercen nazik û hessas de vegera Mistefa Barzanî ya ber bi Kurdistanê tirs û xofek mezîn xiste dilê karbîdesten herdu dewletan her yekî bi qasî 50.000 dînarân ji bo kuştin an ji anina serê Barzanî dan diyarkirin. Xuyaye ku ev hejmîra bilinda diravê ku ji bo serê Barzanî hatibû diyarkirin, giringîya xebat û bizava Kurdan ya di bin serokatiye Berzanî di wê demê de dide eşkere kîrin.

Bi hezaran sal e ku kurd bona azadîyê şer tike

Lê Mistefa Barzanî piştî jîyanâ rewşa wan salên ku li durî Kurdistanê û di bin çavderîya berpirsîyarên dewleta Îraqe de derbas kiribû, vê carê bi hurbuni xebiti ku hêzek leşkerî ya rîkubêk li dora xwe bicivîne. Ji bona wê jî di 28.07 Julaya sala 1943-an de bi awayekî nîhînî ji rojhilatê Kurdistanê vegevî cihwarê bay û kalên xwe Barzan û di demek kurd de karê zêdetir ji du hezar (2000) pêşmerge û şervanê mîrxas li dora xwe kombike. Bi vî rengî Mistefa Barzanî serhildana xwe ya duduyan di Julaya sala 1943-an de da destpêkirin û şoreşa Barzan ya duymîn ji heyâ bihara sala 1945-an berdawam bu. Di vê serhildanê da ji Kurdan li hemberi hêzîn dewleta Îraqe gelek serkeftin bi dest xistin.

Di çaxê şoreşa Barzan ya duymîn de ji 2-ê Oktobra sala 1943-an heyâ 10-ê Novambra sala 1943-an dijwartirin şerên bixwîn




rastîya dîrokî bu ku di navbera Kurdan de hevgirtinek bîhêz pêkhatîbu. Lî mixabin merc û rewşa sîyasîya cîhanê, dîroka Kurdan ber bi rîyek din ya berovajî berjewendîyên Kurdan ajo.

Yekemîn serhildan û şorêsa Barzanî di roja 9-e Sibata sala 1931-an (09.02.1931) de bi besdarbuna 80-ê şervanê Kurd di bin serokatiya Mistefa Barzanî de di şerekî bi navê (Berqê Begê) li diji artêşa Îraqê destbêkir. Di vî şerê ku piştre di domandina qed-îra sîyasîya Kurdên başûrê Kurdistanê de rolekî gîring lîst, hêzîn artêşa Îraqe bi giranî li hemberî şervanê kurd şikestê xwarin û xisarek canî û maddî ya zêde bi dewlwta Îraqe ket. Li hemberi şehîdbuna 5 pêşmergâyê Kurd û birindarbuna hejmarek kêm ya şervanê kurd, artêşa dewleta Îraqe 126 kuştî û bi sedan birîndar li pey xwe hîştibûn.

Ev tê wê wateyê ku di çaxê serhildana sala 1931 û 1932-an de édi tiwan û hêza Mistefa Barzanî wek rîberekî şareza li hemberî hêza dûjmin bi temamî hatibû eşkere kîrin.

Di şere Dola Vajîya de Mistefa Barzanî yê 28 salî bi wan şareziyênu ku li ser taktikên şerê partizanî hebun, karî bi hewkarîya şervanê xwe 235 esker û fermandarê artêşa dewleta Îraqe bikujin û bi sedan kes jî hêzîn dewletê jî di vî şerî de birindar bun. Ev di helakî da bu ku ji şervanê Barzanî tene 12 kes hatibûn şehîd kîrin. Di vî şerî da jî ber wan hîriş û berwanîyen ku li gor zanist û taktikn şer bênumune bun, stîrka şansê Mistefa Barzanî wek rîber û serleskerê kû jê hatî roj bi roj gestir bu û wî karî di nava Kurdên hemu Kurdistanâ mezîn da hêzek menewi ya bilind biafirîne. Bona wî vî şerî ne tenê di nava Kurdan de belkî di nava medya dewletê cîran û cîhanî de ji dengekî bilind veda. Ji bona bêtir nasandina van calakîyen dîrokî li ser hereketê Barzanî pewiştiyek gîring bi lêkolînê akadêmik û zanistî heye.

Bihara sala 1932-an artêşa Îraqe bi hevkarî û piştgîriya hêza esmanî û leşkerîya dewleta kedxara Brîtanîya, hîrişek giran bir ser herêma Barzan. Gundê Barzan ku wek navendeke



partîya Hîwa ji bo berfiehkîrina kar û xebata xwe ya sîyasî û leşkêri ku bikaribûn ji hêza serleskerî şareza mîna Mistefa Barzanî û şervanê wî mifayê wergirin di 12.07 Ji sala 1943-an de organîzasyona nîhîniva endam û sempatê

di navbera hêzîn Kurd û hêzîn dewleta Îraqe de qewimîn ku di tevaya şerîn cêbuşî de rejîma Îraqe rastî xisarek mezîn maddî û mrovîti bu û bi hezeran leşkeren wan canê xwe ji dest dan.

(dûmahî rûpêla 4)

# Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gênelâ Mistefa Barzanî

## 44 sal ji ser wefata Serok û Rêvebirê Gellê Kûrd Gênelâ Mela Mistefa Barzanîyê hertim zindî re derbas bû

(despêk rûpêla 3)

Di dîroka azadîxwazîya gelê kurd ya li Başûrê Kurdistanê şerên şoreşa Barzan ya duyemîn an ku şerên Şaneder, Xêrîzok, Gurêtû, Mezinê û şere Meydana Morîkê cîhekî girîng digirin ber xwe. Êdî ji wê şoreşa duyemin û pêda mora netewayîti bunê bêtir zêdetir ruyê xwe di herekeea Barzanîyan de daxuyakirin û partîya Hîwa û hemu efser û serleskerên Kurd ku di nava artêsa Îraqe de mijûlî xizmete bun bi rihek niştimanperwerî piştgirîya vê serhildan û bizava netevi kirin. Xisara mali û canî ya ku dewleta Îraqe li hemberî şervanên Kurd tuş bibu ew neçarkirin ku di 29-ê Novembera sala 1943-an de dawa gotubêjê ji seroke hereketê Mistefa Barzanî bikin.

Di 15-ê çirîya paş sala 1945 (15.01.1945) - an de encumena Azadîyê hat pekanîn. Desthilatdarîya Îraqe li derfeteke digerîyan ku hêzên xwe xurd û berfireh bikin û bi derbeyeke yekcarî şoreşa Barzanî tekbişkîne, lê Kurdish ji baweriya xwe bi desthilatdarîya Ereban



nedîhanîn. Bi vî awayî zemineya serekî din di navbera herdu alîyan de hat duristkirin. Gotubêja di navbera herdu alîyan de negîşt tu encamekê û bi sere 25-ê Augusta 1945-an (25.08.1945) hevditînên du alî bi dawî hatin.

Kurdan careke din di 5-ê çirîya peş sala 1945-an de (05.09.1945) di şere bi nave Meydanê Morîkê de hemasêyek dîrokî afirandin. Di vî şerî giran de artêsa Îraqe bi ji destdayîna 480 kuşti û 80 dîlan ji esker û fermandarîn xwe carek din bi vê heqîqetê hasîyan ku nikare bi tenê li hemberî şervanên kurd li berxwe bide. Ji ber ku di şerî navbirî de kurdan tenê 5 kûşti û 7 birîndar hebûn û nav û bangê berxwedana kurdan li her çar perçen Kurdistanê gerîya. Êdû kurdê hemu Kurdistanâ mezîn, Başûrê Kurdistanê ji xwe re kirin Keîbeya gêhiştina xwezî, hesret û cîbicikirine daxwazîn xwe yê netewî. Di wan salan de Mistefa Barzanî herçend hê di jîyane de bu ji Kurdish hemu dînyayê re bibu lîderekî efsaneyî.

Dema ku şoreşa Kurdish

pêşket, dewleta Brîtanya dîsan bi piştgirîkirina ji dewleta Îraqe, careke din qedera siyasiya Kurden Başûre Kurdistanê guherand. Lî idî navê Mistefa Barzanî mîna xebatkar û serokekî qehreman li her dera Kurdistanê bi camêri belav bubu.

### Barzanî û Komara Demokratîka Kurdistan (Mihabad 1946):

Piştî şerî bi navê Meydanê Morîkê dewleta Îraqe bi hevkarîya hêza esmanîya Brîtanya ku jib o berjewendîyen xwe yên aborî hemu yasa û qanûnên mirovanetiye binpê dikirin, karê Barzanîyan tuşî sikeşte bikin û newekhevîya hêzen her du alîyan, Şêx Ehmed û Mistefa Barzanî neçarkirin ku bi biryarek nu di 11-ê Oktobera sala 1945-an (11.10.1945) de ji rîya Keleşin ya nezîkî bajarê Sînoyê bi armanca hevkarîya komara Demokratîka Kurdistan bi hejmarek mezin xwe bigîhînîn Rojhîlata Kurdistanê û malbatê Barzanîyan li heremîn Mirgewer, Tirgewer, Sino, Negedî û Mihabad hatin bi cîh

Mistefa Xoşnav, Mîrhac û Reis İzzet di bin berpirsiyârîa wî de bun. Damezirandina Partî Demokratî Kurdistanî Îraq, Tekcuna Komara Kurdistan û Meşa dîrokî ber bi Sovyêtistanê: Salakê piştî damezrandina Partî Demokratî Kurdistan (piştî Partî Demokratî Kurdistan Iran) piştî şewra ku bi Pêşêvaye Şehîd Qazi Mihemed û karbîdesten komara demokratîka Kurdistanê re hatkirin, di 16-ê Augusta sala 1946-an (16.08.1946) de Partî Demokratî Kurdistanî Îraq ji di bin serokatiya Gênelâ Mistefa Barzanî de ji bo bizava Kurdên Başûrê Kurdistanê hat damezrandin. Piştî ku di dawîya sala 1947-an de komara Dêmokratîka Kurdistan têkçû, Mistefa Barzanî bi hişyarbunek zêde xebîti ku li hemberî dewlîta Îrane berxwedanê bike û bê zerer û zîyan ber bi sinorê Kurdistanâ Başûr û Bakur hereket bike.

Di 31-ê Adara sala 1947-an de dema ku Mistefa Barzanî û şervanên wî pêhesîyank û Pêsewa Qazi Mihemed hat idamkirin, xemgîni û bêdengiyek mezin ket nava wan.

Di 15-ê nîsana sala 1945-an de hemu malbatê Barzanîyan bi serokatiya Şêx Ehmedê Barzanî vegeerin. Başûrê Kurdistanê û xwe teslimî berpirsiyâren dewleta Îraqe kirin. Mistefa Barzanî ji meşa xwe ya dîrokî di 6-ê gulana sala 1947-an de ber bi Yekîtiya Sovyêtî, da destpê kirin. Lî meşa wan ya xwe va ji Mihabâde derketin û di yekemîn hefteya meha Adara sala 1947-an de serê Nalosê di nawbera her du alîyan de anku hêzên Kurd û Îraniyande qewmi. Ji wê û pêda heya dawîya Adara sala 1947-an şerîn Gucar (gundeki herêma Mirgever), enîya Sîno û Negedî, şerî Qarnî li herema Xanê û şerîn Ewrîsî û Helec li herema Mirgever ku di tevaya şeran de hêzên Îranî bi berxwedaneken mezina hêzên Barzanî re ru bi ru mabun, di navbera her du alîyan de qewmin.

Di 3-ê Nîsana sala 1947-an de(03. 04.1947) di navbera hêzên Barzanî û artêsa Îranî û caşen ku hevkarîya dewleta Îranî dikirin, şerî Nêrgî an ji Berêzer(lî Mirgewer) çêbu ku Mistefa Barzanî bi xwe ji di vî şerî de bi sivikî birîndar bu. Ji ber şertîn nebaşen hewayê (etmosfer), destpêka biharê serok Barzanî û şervanên wî di 19-ê nsîsan 1947-an de neçar man ku vegeerin nava axa başûrê Kurdistanê. Lî zexta dewleta Îraqê û hêsbûna Şêx Ehmedê Barzanî û malbatê Barzanîyan, Melle Mistefa neçar kirin ku bi hêzek taybetî ku ji 502 pêşmergeyên herî mîrxas pêkhatibu di 25-ê Nîsan sala 1947-an(25. 04. 1947an) xwe bigîhîne gundê

Bayê li bakure Kurdistanê.

Lê artêsa dewleta Tirkîyê ji li hemberî hatina wan kete nava tevgerê û ew neçar man 2 roj

bi hemu top û tank û balefirêne xwe demek dirêj bu ku amadekarîyên xwe kiribun, di her sê rojan de bi giranî şikestê




piştî anku di 27-ê nîsana sala 1947-an de xwe bigîhînîn Gundê Cermê(an ji Cermî) û Bedkarê li rojhîlât Kurdistanê ku dikevin jêriya cîyayê Şehidan. Li wê derê li şerî cîyayê Xehîdan Mistefa Barzanî bi dengeki xemgîn û bîhêz wiha got:

Geli pêşmergeyey!! Binêhirin, ji şerî vî cîyayî em golla Wanê û Urmîyê her duyan jî dibînin, her du jî cîhwarê herî kevnare jîyana bav û kalêne mene, lê li ser vê axa xwe em mehkumî, mirin û revê ne û dagirkerên Kurdistanê nahêlin em li ser axa xwe di rihetîyê de bijîn. Guneha me tenê Kurdayetî ye, hişyar bin û eme biser bikevin, cîmkî em ji xwe re dixebeitin...!( Mistefa Cihangir Şatî yek ji wan 502 kesan bu ku bi serok Barzanî va çubu Sovyêtistanê bu.

### Jîyana li Sovyêtistanê û siyaseta Baqîrov li hemberî Barzanîyan:

Di 18-e hezîrana sala 1947-an (18.06.1947) de Mistefa Barzanî piştî 51 rojan meşa xwe ya dijwar, şervanê herî dawîyê ji 502 servanên hêza xwe bu ku ji rubarê cema Erezê derbasî nava axa Sovyêtistanê bu.



Hereketa Barzanî û şervanên wî ber bi sînore Îran û Yekîtiya Sovyêtî didome û ew ber bi heremê Makû dimeşin. Di 9-ê heya 11-ê Gulana sala 1947-an de şerîn mezin û berfireh di deşta Makuyê û cîyayê derdora wê de sê roj û sê şevan bi giranî di navbera her du alîyan de berdewam bun û di vî şerî dijwar de herçend artêsa Îranê

(dûmahî rûpêla 5)

# Jîyan û bi serhata azadîkarê gelê kurd Gêneral Mistefa Barzani

## 44 sal ji ser wefata Serok û Rêvebirê Gellê Kûrd Gêneral Mela Mistefa Barzanîyê hertim zindî re derbas bû

(despêk rûpêla 4)

Baqîrov (Serokkomarê wê demê yê komara Azerbaycanê) ji destpêka hatina hêzên Barzanîyan bi helwestek şovêniştî dan û standin bi wan re dikirin. Xuyabu ku ew ji di bin tesîra desthilatdarê komara Tirkîye de mabu ku hebuna netewa kurd ïnkar dîkin û Kurdistana bakur di wan salan de di bin siya esmanekî reş û bi goman de mabu. Bona hebuna Kurdê komara Azerbaycanê jî ku bi hejmara xwe ji kurdê komara Ermenîstanê zêdetir jî bun, ji aliyê desthilatdarê komara Azebaycanê ve dihat ïnkar kirin.

Li ser helwesta nifşparêziya Baqîrov di 29-ê Tebaxê 1948-an de Barzanî û hevalên wî ji bajarê Baku ber bi Taşkend (paytextê komara Uzbékistanê) hatin veguhastin û li nêzî wî bajarâ hatin bi cîh war kirin.

Di 13-ê Adara 1949-an de bi pilan û komployen Baqîrov û bi destura berpirsyarêna para parastina Yekîtiya Sovyetistanê M. Barzanî ji hevalên wî cuda kirin û li herêma derya Ûral bi awayekî desteser(dest bi ser) û di bin çavderîya tund û tûj de, demeke dirêj jîyana xwe derbas kir. Lî karbidestên Sovyetistanê di 9-ê ûlona sala 1951an de careke din Mistefa Barzanî

Di çaxê desthilatdarîya Xuruşov de rewşa sîyasi û jîyana Barzanî û hevalên wî hinekî baştar bibu.

**Desthilatdarîya Ebdulkérîm Qasim, vegera serok Barzanî bo İraqê û Beesî:**

Piştî ku di 15-ê tîrmehê sala 1958-an de komek ji efserên İraqî bi serokatiya Ebdulkérîm Qasim desthilatdarîya xane-dana paşayêن Haşimî û Nurî Seîd bi zerbeyek eskerî ji holê rakirin, di 6-e çiriya pêş sala 1958-an de Mistefa Barzanî piştî 11 sal û nîvan derbiderî û jîyana durî Kurdistanê, li ser vexwesdina Ebdulkérîm Qasim vegerin İraqê û li Bexdayê bi cî û war bun. Pêşwazîya ku di çaxê vegera serok Barzanî de ji aliyê kurd û erekban ve jî hat kirin, pir germ û buyerek dîrokî bu. Mistefa Barzanî pir xebitî ku xwe bi şert û mercen rewşa sîyasiya Ebdulkérîm Qasim re biguncîne û heta hinek gotinê wî hebun ku gele kurd hez nedikir û bi başî nedidîtin ku serokekî mîna Barzanî ji Qasim re bêje:

**"EZ XWE BI SERBAZEKî WE DIZANIM"**

Lî Barzanî bi van gotinan dixwest xurtura efserekî xwedî desthilat, têr bike û gelê Kurd û erek di nava aşîyiye de bi hevre bijîn. Di destpêkê de Ebdulk-

soreşek din ya li dijî dewleta İraqê bu.

Di hemu hevpeyvînê ku gêneral M. Barzanî bi roj-namevanê biyanî re pêk anîne, ew hertim li ser biratîya gelan û jîyanek tijî astî bê sazkin.

**Barzanî di hevpeyvîneke xwe de dibêje:**

"Em aştiyê dixwazin û bila şer bi dawî be ku kurd û erek bi awayekî birayane û di nava aşîyiye de bi hevre bijîn...! (Ji hevpeyvîneke têlevîzyonî ku rojnamevanekî İnglîzî pere çekirîye).

Di 11-ê ûluna sala 1961-an de Mistefa Barzanîyê nemir soreşa xwe ya ku 14 salan berde-wam bu li dijî rîjîma Ebdulkérîm Qasim û Beesîyê ku piştî wî hatin, dadeşpêkirin.

Mezin buna Mistefa Barzanî di vê rastîye de yê ku wî karî bi xebat û çalakîyên xwe ji serokatiya hoz û eşîretekê, sal bi sal ber bi pêşve bimeşe û di nava dîroka xebata bi şan û şerefâ netewa Kurd de weke serokê neteweke bê hezkirin. Di wan salan de Mistefa Barzanî wek nunerê pirsgireka millîya Kurd li hemu cîhanê dihat nasandin. Ji bona wê jî başurê Kurdistanê bibû qada hevdîtina roj-namevan û sîyasetvanê biyanî bi serokê Kurd Mistefa Barzanî re.

Di 8-ê Sibata sala 1963-an(08. 02. 1963) de rîjîma Ebdulkérîm Qasim bi aliyê Beesîyan ve hatibu lidarxistin, tekçû û Ebdulkérîm Qasim hat kuştin. Barzanî ji bo ku di wê dema dijwar de azadîxwazên kurd û erek bi destê Beesîyan neyîn kuştin, derîye Kurdistan û heremên azadkirî ku di bin desthilatdariya partîya wî de bun, ji wan re vekirî hîst û bi vî awayî gelek kesan cane xwe ji destê Beesîyan rizgarkir. Di wan rojîn hessas de ku Bexda bibu qada tolhildana Beesî û alîgîren rîjîma Ebdulkérîm Qasim, ev sîyaset, durdîtina û mîrxasîya Mistefa Barzanî carek din hîzr û ramanê mirovhezîya wî ji herkesî re dan ispatkirin.

Piştî ku ji salên 1963-an heya Sibata sala 1968-an desthilatdariya İraqê di navbera Ebdulselam Arîf û Beîsîyen de dest bi dest dibu, wan piştî ku hemu dijberen xwe serkutkirin, vê carê berê xwe dan Kurdistanê û heya Adara sala 1970-an şerrîn dijwar di navbera herdu alîyan de qewmîn. Piştî xebata salên giran di 11-ê Adara sala 1970-ê de li pey gotubêjîn dur û dirêj di çarçoveya desthilatdariya İraqê de otonomî ji Kurdê Kurdistanê re hat dîyarkirin. Xuyabu ku Beesî û vê biryar û lihevhatinê semîmî

nebun û li benda derfeteke bun ku kar û barê xwe yê desthilatdariyê rîk û pêk bikin û piştre dîsan bi Kurdan re bikevin nava şer û hereketa Kurdistanê bi yek carî bifetisînin.

ji alîyê Rojava û Amîrîka ve wek jandarme Rojhilata Navîn dihat hesibandin, mezintirin xiyaneta dîrokî li Kurdan kir. Pişti wê bi sedhezaran Kurd ji başurê Kurdistan mişextî Rojhî-



Ev sirra wan bi kiryareke hovane zu ji Kurdan re eşkera bu. Yanî dema ku di 29-ê ûlona sala 1971 an(29. 09. 1971) de iştixbarata İraqê bi şandina çend kesen di kîcîn meletiyê de xwest ku rîberê şoreşê Mistefa Barzanî bikuje û ew di vî karê xwe de bi ser neketin, careke din şerîn dijwar di navbera herdu alîyan de dest pêkirin. Vê carê dewleta İraqê xebîf ku bi hevkarîya hêzek sîyemîn şoreşâ Kurdan tuşî şikeste bike. Şer di Adara 1974-an de bi germî li hemu heremên başurê Kurdistanê dest pêkirib. Di Adara sala 1974an de dewleta Beesîyê İraqê qanuna xwe ya otonomîye ûlam kirin. Lî Mistefa Barzanî ji ber mesela Kerkuk, Xaneqîn û Musilê qanuna otonomîya ku dewletê ûlam kirib, nepejirand û ew otonomîya Beesîyan otonomîyek leyîskî bi nav kir. Ji bona wê jî di Çîrîya pêş sala 1974-an de bi qasi 17 mehan conta Beesîyan bi hemu şeweyen hovane, hîrişî ser gund û bajarê Kurdistanê kirin. Bi vî rengî Beesîyan mirin, reşerojî û derbiderî li hemu Kurdistanê direşandin. Wê demê jî cîhan li hemberî van kiryarên Beesîyan kerr û bêdeng bu û xaça sora(Heyva Sor) cîhanî ji bi ci şeweyan hevkarîya kurdan nekirin, ji ber ku ew ji di bin tesîra dewleta İraqê da mabun û ev jî berêvajî zagonê vê rîexistina cîhanî bu. Di nasandina pirsgireka Kurd de şoreş û xebata Barzanî rolekî bercav lîst.

**Peymana Elcezayer, rewşa doza şoreşâ Eylülê û Wefata Serok Barzanî:**

Di 6-ê adara sala 1975an de İraq û Iran bi navbeynkarîya serokkomarê Elcezayîrê (Hewari Bu mîdyen) û girêdana peymana Elcezayîr lihev hatin. Mihemed Rîza Sahî Pehlewî kî

latê Kurdistanê bun ku li ser-anserî Iranê wek penaber ji Kurdistanê hatin durxistin. Durutiya şahê Iranê ku xwe warsê tac û textê padışahîya hemu Arîyan dihesî band, ji dîrokê re eşkera bu. Wî bi vê peymana bi Beesîyan re bi cîhana sîyasetê da selmandin ku bizava nemir Barzanî bandorekî mezin li ser Kurdê Rojhilatê Kurdistanê jî hiştiye û ev bizav ji bo desthilatdariya wî ya paşerojê li Iranê ji metirsyek mezin bu.

Mistefa Barzanî piştî ku li bajarê Kereçe hat bi cîh kirin, di hemên salê de çu Amîrîka û di 1-ê Adara sala 1979-an dema ku gelê kurd piştî tekçuyîna rîjîma sîtemkara 2500 salîya Şahenşahî li Iranê li bendê bun ku Mistefa Barzanî vegere Kurdistanê û şoreş nu li dijî dewleta İraqê bide dest pêkirin, bi nexweşîya kansîrê li nexweşxaneyeke Amîrîkayê wefat kir.

Di roja 5-ê Adara sala 1979-an de termê Mistefa Barzanî bi merasimeke li bajarê Sino ku bi sedhezaran kes têde besar bubun, hat vesartin.

Lî piştî mirinê ji termê Mistefa Barzanî dîsan bu armanca komployen dewletên dagirker ku dixwestin Kurdan bi destê Kurdan bidin kuştin. Mihaciret û derbiderî li ser axa Kurdistanê heta di çaxê mirinê de ji dev ji Mistefa Barzanî bernedida.

Di 6-ê çiriya pêş sala 1993-an termê serokê Kurd Mistefa Barzanî û kurê wî nemir İdrîs Barzanî ji gundê Helecê yê di herema Mirgewer de vegeandin cîh warê bav û kalêñ wî herema Barzan. Mistefa Barzanî di dîroka sîyasiya gelê Kurd de buye nirxekî gelempêrî û wek lîdêr û serokekî doza bi şan û şerefa Kurdistanê hê jî di dilê gelê xwe da dijî.

**Amadekar:  
Tahir Silêman**



vegerandin Taşkendê.

Di 5-ê Adara sala 1953-an de Josef Stalîn mir û Xuruşov wek sekreterê giştî û serkarê Yekîtiya Sovyetistanê ji aliyê Partîya Komunist ve hat hilbijartîn. Li gor tîlimata Xuruşov, Barzanî li paytexta Sovyetistanê (Moskovayê) hat bi cîhwar kirin û cend caran ji wan bi hevre hevdîtin pekanîn.

*Me di 141 bernameyên xwe yên berê da perçeyên ji berhemên zanyarî yên kurdzanên mezin bi wergera kurdî dane.*

*Xwendevanên delal, ji rîzenivîsa "Berhemên kurdzanên me" vê carê emê nivîseke ji berhema profêsor Ezizê Zîyo Bedirxan yên bi sernivîsa "Barzanî li Üzbékistanê" raberî we bikin, ku me ji pirtûka wî a zanyarî "Merivê efsaneyî" ji rûsî wergera andîye kurdî.*

*Em dixwezin xwendenvanên xwe hayadar bikin ku ev pirtûka delal bona çapê amade ye, wê zütirekê bê weşandinê.*

*Rêvebirê bernameyê û wergera ji rûsî: Têmûrê Xelîl.*

### Berhemên kurdzanên me – 142

Di tebaxa sala 1948an da barzanîyan bi komên biçük va li trênan siwar kirin û berê wan dane Üzbékistanê. Hilbet, di karê şandina desteya Barzanî li Üzbékistanê M. Bagirov roleke mezin lîst, lê piranî ew cîguhastin bi helwesta Moskvayê di hindava kurdan û sîyasetmedarêne wê yên mezin va girêdayî bû. "Di destpêkê da, dema di fikira Krêmlê da hebû hukumê xwe li ser Îranê bide xurtkirinê, kurdan ji sînor dûr ne dixistin; paşê hatine bawerkirinê, ku Îran ji dest wan çûye, wê demê kurd pişt guhê xwe va avêtin. Gerekê çareyek ji wan ra bidîtana û bîryar kirin wana ji Kavkazê dûr bixin, bişînîne Asîya Navîn". Bi bîryara Şêwra Wezîrîn YKSS ya 9ê tebaxê sala 1948an desteya Barzanî bi temamî ji navçeya Bekûyê birine ser axa KSS Üzbékistanê, û ew li barêgeha berê ya Wezîreta Karêndê Hundur (hêwirgeha Vêrxnê-Komsomolskaya) ya riya hesin ya Taşkendê bi cî kirin. Piştî çend mehan, di dawîya sala 1948an M. Barzanî (bi daxweza wî a bi israr) ji alîyê Sêkrêtâre KM PK (p) ya Üzbékistanê Û. Yûsûpov da hate qebûlkirin û jê ra nerazîbûna xwe ya berk got derheqa rewşa desteya xwe da û hîvî kir alî wî bike rastî Stalîn bê bona derheqa rewşa gelê xwe û planêne xwe da jê ra bêje. Mustefa Barzanî herwiha hîvî ji Yûsûpov kir 5 zabîtên desteya xwe bo xwendinê bişîne Dibistana Taşkendê ya Partîyê, perwerdeya leşker û zabîtên desteya wî bide teşkîlkirinê, bona ew fêrî karê balafirajotîyê, tankîstan û hwd bibin. Di dawîya sohbetê da Barzanî di ser gotina xwe da zêde kir, ku eger destûra wî nedin here Moskvayê, ewê xwe bikuje. Hîvîkirina Barzanî nehate pejîrandin. Her tişt wisa bû, ku kurd ketine rewşeke xirabtir. Di wan rojan da, dema Barzanî bi hîvî li benda nûçeyen dilxwesîyê bûn ji serokatîyê, li Moskvayê bo wana sirgûnkirineke nû ya li xerîbîyê amade dikirin. Ji belgeya giring ya wê demê – nameya S. Krûglov bo Stalîn helwesta dûrneditî ya

serokatîya Sovyet di hindava kurdan da xuya dibû: "Wezîreta Karêndê Hundur ya YKSS ser wê bawerîyê ye, ku baş dibe desteyen kurdan ji hev bixin û wana beş-beş bikin, bişînîne kûraya navçeyen KSS Üzbékistanê, ku kurd nikaribin bi hevra bikevine nava pêwendîyan û M. Barzanî û hogîrên wî nikaribin bi kurdên li çend welatan belavbûyî ra pevgirêdanaz saz bikin û tesîr li ser wan bikin. Desthilata warênd kurd lê dimîn mecbûr bikin kurdan bikine nava karê malhebûna gund û senaya komarê. Kontrolkirina wan daynine li ser dayîreyen Wezîreta Karêndê Hundur ya Üzbékistanê. Ev pêşnî-

ku ew bi karênd giran va dabûne cezakirin. Li wwana qedexe kiribûn ji hevdu ra binivîsin, zordestî li wan dikirin. Şert pir giran û nemirovane bûn". Bi vî awahî, sala 1949an şervanênd kurd kirine çend kom û li van waran bi cî kirin: li herêmên Üzbékistanê yên Samarkandê – 80 kes, Bûxarayê – 57 kes, Taşkendê – 200 kes, herwiha deverên Namanganê, Andîjanê û Fêrganayê. Mela Mustafa bi xwe şandine navçeya Mûynakê ya Karakalpakiyayê û di bin çavdîriya komêndatûra Wezîreta Karêndê Der di sovxozeke pembu da karê terezûvanîye dane wî... Halê nemirnejî, ku kurdên azadîhiz

"Lazim e koma kurdên Iraqê, ku li 6 herêmên KSS Üzbékistanê dimîn û jîmara wan 483 kes e û Mela Mustafa Barzanî serokatîli wan dike, cîguhastî navçeyekê an ji du navçeyen herêma Taşkendê bikin. Bis-pêrine sêkrêtâre KM PK (p) ya Üzbékistanê hevalê Nîyazov ku li karxaneyen Wezîreta senaya xurek kar bidine kurdên Iraqê û pirsên xanîyen wan yên bo jîyanê çareser bikin; hemû mecalan saz bikin bona pirsên wan yên aborî û tundurustîyê bidine xweşkirinê, di nav wan da karê sîyasî-perwerdeyê û çandî-ronahîdarîyê geş bikin, herwiha wana fêrî têknîka malhebûna gund bikin. Bona pêkanîna vê bîryarê bersîvîdarîyê daynine ser Wezîreta Dewletê ya Aramîyê ya YKSS û di nav kurdên ji koma Mela Mustafa Barzanî karê anegor bikin". Dest bi pêvajoya vegerandina kurdan ji şirgûnîyê ber bi herêma Taşkendê bikin. Di îlona sala 1951ê da balafira taybet rîberên desteya Şêx Suleyman û Esed Xoşewî ji Mûynakê anî rex kenarêne çemê Aralê

Cîguhastina kurdên din heta dawîya meha çirîya paşin sala 1951ê derengî ket. Li rex bajarê Taşkendê xanî dane Barzanî[2], kurdên dinê li bajarê Brêvkê bi cî kirin, ku 50 kîlômêtren dûrî Taşkendê bû. Hemû jî piştî bêrîkirina du salan şa dibûn, xwesma bo vegera Barzanî, behsa rewşa hevdu û berxweketinê xwe dikirin. Destûra xortan dan bikevine xwendinxanayan û dayîreyen xwendîna bilind. Piranîya kurdan ketine nava karê malhebûna gund, rewşa wan ya sosîalî her diçû xweşteş dibû. Şervanê Barzanî sala 1952an bi tevayî berevî hêwirgeha Almazarê, herêma Taşkendê kirin. Gelek şervan li vira bi jînên rûs û teter ra zewicîn. Bavê xudanê vê pirtûkê, aqilmendekî kurdan yê binavûdeng, Zîyo Bedirxan, gelek caran behsa rasthatînê xwe bi barzanîyan ra kirîye, ku li rex Taşkendê diman, û herdem jî bi dilgermî ew bîr dianîn. Berî 60 salan Zîyo Bedirxan bi riya dostekî xweyî kurd bi çend hogir û hevalbendê Barzanî ra bû nas. Ew rasthatîn heta-hetayê di bîra wî da ma, wek bîrânîneke here xweş di jîyana wî da. Bavê xudanê vê pirtûkê nikaribû helwesta wan a germ û dilvekirî di hindava merivan da ji bîr bikira. Ji wan kesên mîrxas û cwebexş paqîjî û dîlxwesî dîbarî, û ew helwest tesîreke mezin li ser Zîyo Bedirxan genc kirîye. Gênerâlê Dayîreya Aramîyâ Dewletê û İnstrûktörê beşa Navnetewî ya KM Mançixê P. Sûdaplatov di pirtûka xwe da destnîşan dike: "Di adara sala 1952an da ez şandime Üzbékistanê bona ez li warê nêzîkî Taşkendê rastî Barzanî bêm, bona çareserkirina pirsgirêkîn ku serî hildabûn. Helwesta desthilata cî di hindâ-



yar bi hevalê Yûsûpov ra.

Hevalê V.M. Molotov bi pêşnîyara Wezîreta Karêndê Hundur ya YKSS ra razî bû. Ez hîvî dikim bîryara xwe bidin. Wezîreta Karêndê Hundur yê YKSS S. Krûglov. Sibat, 1949". Gorî malûmatîyên paşdemê, İ. Stalîn bi pêşnîyara Wezîreta Karêndê Hundur ya YKSS ra razî bû. Desteya Barzanî zivistana sala 1949an ji bingehê va ji hev xistin. Karmendên Sovyet planeke xapînok ya sirgûnkirina barzanîyan amade kiribûn. 13ê adarê sala 1949an gênerâlê Sovyet hate Taşkendê, ji Barzanî ra got ku ferman heye wî bi balafira taybet bibine Moskvayê, li wir ewê rastî Stalîn û rîberên YKSS yên din bê. Hîvîya barzanîyan çê bû, ku rewş ber bi başyê va diçê. "Lê balafir ne ku berê xwe da Moskvayê, lê fîrî bajarokê li rex kenarê Behra Aralê"[1], ku dişibîya sirgûnkirinê". Piştî wê barzanîyan din bi komên biçük va belayî warênd cuda-cuda yên Üzbékistanê kirin. Casûsên Sovyet û karmendên Wezîreta Karêndê Der planeke wisa bêbext amade kiribûn, ku ne tenê haya komeke ji nûnerên hogîrên Barzanî ji qedera komên din tunebû, lê di ser da jî di destpêkê da nîzanibûn ka ew li kune. Mesûd Barzanî li ser bingehê bîrânînê nûner û dîtindarê Barzanîyan dinivîse: "Di paşdemê da eşkere bû, ku her komeke Barzanîyan biribûne qışleyekê, li wir ew di bin çavdîriyê da bûn. Di kolxozan û senayê da kar dabûne hemûyan. Rewş wisa bû, weke

Gulnar û Ocalan, rojê Ocalan li Moskva. - Stembol, 2005. - Rûpel. 181 (bi zimanê tirkî). [2] Karmendê dayîreya Aramîyê ya YKSS V.N. Üdîlov di pirtûka xwe a bi sernavê "Bîrânîn casûsekî" da dinivîse: «Hêwirgeheke dervayî bajêr ya Şêwra Wezîran ya KSS Üzbékistanê, ku li warê Kîbrayê, 15 kîlômêtren dûrî Taşkendê bû, dane Mela Mustafa». [krd.riataza.com](http://krd.riataza.com)



## ÎDRÎS BARZANÎ DILÊ ME DE ZINDÎ YE

### Idrîs Barzanî di 36emîn salvegera wefata xwe de tê bibîranîn


Di ser wefata Idrîs Barzanî de ku bi tîpêñ zêrîn navê xwe di dîroka têkoşîna Kurdistanê de tomar kir, 36 sal derbas bûn.

Idrîs Barzanî di Adara 1944an de wek kurê mezin ê Mela Mistefa Barzanî ji dayîk bûye. Di 2 saliya xwe de tevî bavê xwe ji bo avakirina Komara Kurdistanê ya Mehabadê koçî Rojhilate Kurdistanê (Rojhilat) dike.

Barzanî di sala 1947an de bi hilweşîna Komara Kurdistanê li Mehabadê çû Yekîtiya Sovyetê. Piştî ku Idrîs Barzanî li Bexdayê dest bi xwendina xwe kir, di sala 1958an de piştî vegera Mela Mistefa Barzanî derbasî Başûrê Kurdistanê bû.


"Wî bi rola xwe di şerê Hindirenê de nav û deng çêkir"

Idrîs Barzanî, yek ji kesayetên bibandor ê



Şoreşa Îlonê ku di sala 1961ê de dest pê kir, bi taybetî bi rola xwe di şerê Hindirêne de navdar bû. Barzanî piştî ku şoreş bi lihevkirina serkidayetiya Kurdistanê bi rejîma Baas re temam bû, hewlîn cidî ji bo yekrêziya Kurdan da.

Idrîs Barzanî di 31ê Çileya 1987an de li gundê Sîlvana yê Urmîyê koça dawî kir û li goristana bajarê Shinô ya Rojhilat li kêleka bavê xwe hat veşartin.



Cenazeyê Idrîs Barzanî û Mele Mistefa piştî serhildana 1991'ê anîn Başûrê Kurdistanê û li gundê Barzan ê Duhokê hatin definkirin.

Îro 36 sal bi ser wefata Idrîs Barzanî re derbas bûn. Têkoşîn û dilsoziya wî ya ji bo doza Kurdistanê hê jî di hişê me de maye.

PeyamaKurd

## Serok Barzanî: Kurdên Feylî beşeke sereke ya gelê Kurdistanê ne

Serok Mesûd Barzanî di Yekemîn Konferansa Zanistî ya Navdewletî ya Jenosîda Kurdên Feylî de gotarek pêşkêş kir û ragihand: "Kurdên Feylî beşeke sereke ya gelê Kurdistanê ne."

Serok Mesud Barzanî diyar kir: "Kurdên Feylî bi awayekî wêrek rûbirûyî hemû wan hewlan bûne ku armanca wan jinavbirina Kurdên Feylî bûn. Lî belê tevî hemû wan hewlan, karîne nasane û kultura xwe biparêzîn."

Serok Barzanî destnîşan kir: "Kurdên Feylî yên şoreşger karîne beşdarî damezrandina Partiuya Demokrat a Kurdistanê û serkirdetikirina Şoreşa Îlonê bibin. Dibe ku beşeke mezin a amadebûyan wê yekê bîzanin ku serkirdetiyênil bilind, ji aliye şoreşgerên Kurdên Feylî ve hatine birêvebirin, ji wan Sekreterê Giştî ye Partîyê, Seroka Yekîtiya Jinê Kurdistanê, Serokê Yekîtiya Xwendekarê Kurdistanê û beşeke din a mezin a postê payebilind."

Di axaftina xwe de Serok Barzanî ragihand: "Kurdên Feylî rîz û baweriyeke wan a mezin li cem Barzaniyê Nemir hebû, ji ber wê dilsozî û intîmaya wan a ji bo karîn xwe hebû. Kurdên Feylî rastî êş û karesatên mezin hatin. Rejîma berê bi çendîn rîyan hewl da Kurdên Feylî dest ji helwesta xwe ya niştimanî berdin, lî belê hemû hewlîn wan têk cûn, loma xwe spartin rîya dirindane, ji wan; veguhestina bi zorê, bi tometa wê



yeke ku biyanî ne, herwiha blokkirina serwet û samanên wan. Heta niha 12 hezar ciwanên Feylî ku temenên wan di navbera 18 heta 30 salî de bû, bi awayekî dirindane hatin jinavbirin, heta niha kes nizane li ku derê hatine veşartin jî."

Nerina Azad

## Serokwezîr Mesrûr Barzanî: Komkujiya Kurdên Feylî beşek ji jenosîda gelê Kurdistanê bû

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî derbarê jenosîda Kurdên Feylî de peyamek belav kir û tê de ragihand, "Komkujiya bi hezaran Kurdên Feylî, di çarçoveya kampanya jenosîda û qirkirina gelê Kurdistanê de bû."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî li Twittera xwe peyamek belav kir û tê de got: "Rejîma berê ya Iraqê bi hezaran Kurdên Feylî koçber kirin û kuştin, ku ev yek beşek ji kampaniya jenosîd û qirkirina gelê Kurdistanê bû."

Her wiha Serokwezîr Mesrûr Barzanî nivîsi: "Îro em daxwaz dikin ku pend ji paşerojê bê wergirtin û ev tawana hovane zêdetir bê naskirin."

Bi amadebûna Serok Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê, Serokwezîrê Herêma Kurdistanê û hejmareke berçav ji akademîsyen, pispor û mîvanen navxweyî û biyanî, duhî 2ê Gulanê Yekemîn Konferansa Zanistî ya Navdewletî derbarê jenosîda Kurdên Feylî de dest pê kir. Ev çalakî bi sponsorîya medyayî ya Kurdistan24 li Hewlîrê tê lidarxistin û dê sê rojan berde-wam be.

Nerina Azad



## Mistefa Hicrî: Dualîbûna referandumâ Komara İslâmî

Herî dawî Xamineyî di civînekê de ligel xwendekarên Besîc, di bersiva daxwazên hinek kesayetîyen siyasî yên rexnegirêne rejîmê de ku daxwaza referandumê li ser mijarên herî girîng û hestiyar ên welat kiribûn, got: Çima ger hemû ev kesen ku dibe di referandumê de beşdar bibin şiyana şirovekirina vê pirsê hene? Gelo ev mesele ci ye?

Derbarê gotinê Xamineyî de, medyayêne dewletê û hinek ji alîgirêne wî pêka rîcka wî hewl dan bi şiroveyen zêdetir û rohnkirîn bi mebesta piştarstkirin an gotinan, xelkê asayı, li kûrahiya hikmet û heqiqeta van gotinan bidin fêmkirin! Ji bo mînak lêdvana Xulameli Hedad di civîna "Şêwreya Hevalbendîn Hêzîn Şoreşa İslâmî de" ku her wî bixwe serkidayetî dikir; Ev lêdvana zêdetir dişbiya bi lêdvânî alîgirê din yên Xamineyî ku bala van rabikêse. Hedad Adil tevî vê ku ragihand referandum dibe sebeba "Fitnê" û îtraf bi vê yekê kir ku ev dibe sebeba alozîrbûna rewşê bo Komara İslâmî.

Bo rohnkirîneke zêdetir a vê mijarê hewcye bibêjin di referandumê de, xelk deng bi siyaset û reftar û bigîşti deng bi mana vê rejîmê nadîn û ev yeka ji li qamûsa Komara İslâmî de jêra tê gotin "fitnê" û bi rastî "dibe sebeba alozîrbûna rewşê bo Komara İslâmî".

Eger wan (Welî Feqîh û koma desthilatdar) piştarst bûna ku dê gel dengê xwe bidin bi rejîmê û rejîm rewatiya xwe bi dest bixe, li gorî gotina Xumeynî "pîvan dengê gel e", renge niha li derheq bi encama referandumê ewqas serhiş nedibûn û nek her bi fitne bas ji wan dikir, belki berevajî wan destpê dikir û dubare dikirin û bi pejrandina şiyana şiroveyen xelkê yên li derheq bi van pîrsan dikevin piroseye referandumê. Heta wira dikarin bibêjin: Rejîm pêşvext li raman û dengê xelkê li derheq bi vê referandumê ageh dare û dizane ku Komara İslâmî bê guman dorana sereke ya referandumê ye, ku xelk bi

şêweya azadane û bi bê tîrs li hêzên serkutker û encamên vê başdarî dikin. Lewma, rejîmê berevajî propagende û hera û hurayê medyayê hikmetî û taqma alîgir, rejîmêke kes nexwaz û nefretêkirî û piştire ji ji nav diçe.



Aliyeke din a vê mijarê eva ye ku, bi salan e xelk ji Komara İslâmî bêzár û bê hêvi bûye, cîmkî di heyama wan salan de, hebûna hêviya çaksaziyê û vekirîbûna nav rejîmê di çarçoveya azadîye de bûye mijareke bê binyat, bi hegêra vê ku rejîm di bersivedan û baştirkirina rewşa jiyana xelkê û sedan daxwazîyen liser hev kombûyî yên rewâyên din xemsar bûye û roj bi roj zêdetir gîvaş xistiye ser xelkê. Armanca tevgera "Jin, Jîyan, Azadî" ku nezî 8 mehan berî niha û piştî kuştina "Jîna" yê ji aliye hêzên "Geşta Îrşad" ve dest pê kirîye, li hundîrê xwe de dirûşmîn pêkhatîşikîn û herifîner li hemû cihêne welat de bilind kirine û heta niha jî berdewam in, li pey derbasbûna tevaw ji Komara İslâmî bûye, tevgerek ku taybetmendiyêne vê zêdetir wek referandumâ "Ne bo Komara İslâmî" ye.

# KOMARA KURDISTANA MAHABADÊ BERÎYA 77 SALAN DI 22-01-1946-AN DA LI MAHABADÊ HATIBÛ DAMEZIRANDINÊ

**Mahabat Kurd Respublikası 22 yanvar 1946-cı ildə yaranmışdı**



Mahabat'da dini və siyasi möhtərəmliyi olan Qazi Məhəmməd, 21.01.1946 tarixində Mahabad ən böyük məscidində parlemento hazırlıq yığıncağını edər, 22.01.1946 tarixində Carcira meydanında Kurd respublikasını elan edir.

1944 "Komela Jiyana Kurd" adıyla qurulan

təşkilat, 1945-ci ildə Qadi Məhəmməd başçılığında "Kurdistan Demokrat Partiyasını" qurar. Mahabatda dini və siyasi möhtərəmliyi olan Kadi Məhəmməd, 21.01.1946 tarixində Mahabad ən böyük məscidində parlemento hazırlıq yığıncağını edər, 22.01.1946 tarixində Carcira meydanında Kurd respublikasını elan edir.

Bütün Kurd və tayfa qruplarının olduğu bu tarixi toplantıda, Kadi Məhəmməd Sovetlər Birliyinin maddi və mənəvi dəstəyinə toxunu kimi Azerbaycan xalqının dostlugundan dilə getirir. 11.02.1946 tarixində parlementoda and içdikdən sonra vəzifəye başlayır. 23.04.1946 da kurd və Azerbaycan hökumətləri arasında dostluq imzalanır. Gənc və dinamik olan kurd hökumətində kişilər iştirak alındıları kimi qadılarda yer alır.

Dövlət Başçılığını Qazi Məhəmməd və Müdafiə nazirliyini Molla Mustafa Bərzanının yer aldığı respublika, 17 Yanvar 1947-ci ildə İran rejimi tərəfindən yıxıldı və 31 Mart 1947-ci ildə Qazi Məhəmməd edam edildi. Kurd Respublikasının yıxılmasıyla Molla Mustafa Bərzani qarşılurmalarдан sağ qalan peşmergeleriyle Sovetlər Birliyinə keçər.

Mahabat Respublikası dövründə "Ey Reqîp" adlı şeir kürdlərin milli marşı olaraq qəbul edildi.

Komara Kurdistanê berîya 77 salan di 22-01-1946-an de li Mahabadê hatibû elam kırın. Serokê Komara Kurdistanê Qazî Muhammed, li Meydana Çarçirayê ya bajarê Mahabadê avakirina komarê, wek rojekə pîroz ji gelên Kurdistanê û raya cîhanê re eşkere kır. Qazî Muhammed di gotara xwe de, destê dostoniyê dirêjî cîranê Kurdistanê kır. Lê avakirina Komara Kurdistanê, di çavêneyaran de, bû kelemeke girs û tûj.

Danasına Komarê, di nav miletê Kurd de, kelcanek nedîfî afirand. Bi qasî hevkarîya kurdan bihêz kır, herweha hevkarîya nava Komara Ezarbeycan û Komara Kurdistanê jî bi hêz kır. Dewleta Tirk wek hercar vê derfeta Rojhelatê Kurdistanê, bi xeterî şîrove kır û xwest bi destdirêjîyê, neyartîyê di nav hevkarîya kurd û ezarbeycanîyan de peyda bike. Jîyana Komarê kurt bû, lê di dîroka Kurdistanê de, bû destan û nimûneya serxwebûn û hevkarîya beşen Kurdistanê.

Tevaya dewletên cîhanê, bi derfet û momenten dîrokî ve hatine damezrandin. Komara Kurdistanê jî bi derfeta şerê cîhanê yê duwemîn ve xeyalîn Kurdistanîyan li Rojhelatê Kurdistanê bi rastîyê wergerand. Di dema şerê cîhanê de, di

sala 1941an de Yekîtiya Sowyetan û Brîtanya Mezin, li ser dagîrkirin û parvekirina Îranê li hev kırın. Di nava demê de, kurdan li rojhelatê Kurdistanê vê derfeta bi kar anîn û dezgehîn xwe yê neteweyî kırın yek. Komeleyê Jîneweyê Kurdistan û Cemîyeta Hêwî peymana hevkarîye ava kırın. Rewşa cîhanê, Îran û Kurdistanê rî ji yekîtiya kurdan re vekir. Bi encama hevkarîya nava hêzîn kurdan, cara yekem PDKî hate avakirin. Avakirina PDKî, pêngaveke netewayetî bû ku di dîroka Kurdistanê de roleke sereke wergîrîye.

Di wê heyamê de, li başûrê Kurdistanê, bi serokatîya Şêx Ehmedê Barzanî serhildan berdewam dikir. Derfeta Rojhelatê Kurdistanê, Barzanîyan ber bi xwe ve bir û di sala 1945an de serokê nemir Mustefa Barzanî jî bi pêşmergeyên xwe beşdarî nava Rojhelatê Kurdistanê bû. Barzanî, bi serokatîya Şêx Ehmed û Barzanîyê nemir ve ji bo xizmeta şoreşa Kurdistanê amade bûn.

Dewlet, bi gelempêr bi du derfetan dikarin bêne avakirin. Derfeta nav xweyî û ya jî derfeten derveyî. Rewşa Kurdistanê ya wê demê ya navxweyî, herçiqasî yekîtiyek sîyasî hati-



bû avakirin jî kelecana avakirina Komara Kurdistanê berfireh bû û alîkarîya pêşmergeyên Başûrê Kurdistanê, bi serokatîya Mustefa Barzanî girtibûn jî mixabin Komara Kurdistanê, ji derfeta avakirin û parastina dewletek serbixwe bêpar bû. Gelek eşîrên kurdan, dest ji pêgehîn xwe û berjewendîyên xwe yêneşîrî bernedan û gelek ji wan neyartîya şoreşê kırın. Rewşenbîrî, xwendevanî li Kurdistanê jar û hejar bû. Kurd bi tevahî û bi rîk û pêk nehatibûn organîze kırın. Civat û neyartîya eşîrî, astengên sereke bûn. Hestênete neteweyî, ne di asta avakirina dewletek serbixwe de bûn.

Derfeta alîkarîya derve ku ew jî alîkarîya Sowyetê bû, ji bo avakirina Komara Kurdistanê sereke bû. Bi alîkarîya Sowyetê, du komardewlet li herêma di bin desthilatdarîya Sowyetê de bûn, hatin avakirin. Ew jî Komara Ezarbeycan (Hukûmeta Milî ya Ezerbeycanê) û Komara Kurdistanê bû. Vê rewşê, derfetek dîrokî pêşkêşî Rojhelatê Kurdistanê kır. Kurdan, bi serokatîya Qazî Muhammed vê derfeta dîrokî bi kar anîn û avakirina Komara Kurdistanê di 22-01-1946an de, li meydana Çarçira ya bajarê xoşewîst Mahabadê ûlan kırın.

Serokê nemir Mustafa Barzanî, ji alîyê hukûmeta Kurdistanê, weke generalê şoreşê û serokê pêşmergeyan hate helbijartın. Barzanî, bi pêşmergeyên xwe, li welatê xwe û şoreşa Rojhelatê Kurdistanê xwedî derket û ji bo hevkarîya nav beşen Kurdistanê, nimûneyek balkês û yekta pêşkêşî dîroka Kurdistanê kır.

Komara Kurdistanê, tenê 11 mehan jîya. Lê di vê dema kurt de, desthilatdarîya Komara Kurdistanê, ji bo tevgera neteweyî, tecrûbeyên bêhempa weke mîras li dû xwe hiş. Lê mixabin, tevgera rizgarîxwazîya neteweyî, ji tecrûbeyen Komara Kurdistanê zêde sûd wernegirt. Derfeta duwem. li Rojhelatê Kurdistanê

tanê, bi şoreşa İslâmî ve derket holê. Di demek kurt de, tevaya Rojhelatê Kurdistanê ket bin desten tevgera Kurd. Lê mixabin piştî desthilatdarîya li ser xaka xwe ya 30 salî hînê jî Başûrê Kurdistanê, ji artêsek hevbeş, aborîyek hevbeş, dadwerîyek hevbeş û perwerdeyek hevbeş bêpar e. Desthilatdarîya Rojavayê Kurdistanê, bi îdeolojiya bîyanî jahrdadayî bûye û vî beşê Kurdistanê ji kurdan xalî dike. Desthilatdarîyek totalîter ku dijî Alaya Kurdistanê û destkeftîyên kurdan tevdigere.

Bakur û Rojhelatê Kurdistanê, ji hevkarî û yekîtiyek neteweyî bêpar tevdigere. Bakurê Kurdistanê, bi îdeolojiya Türkîyeyîbûn û Tirkîtîyê ve dagîrkerî xurtir kırîye. Lê derfeta sîyem ya Rojhelatê Kurdistanê li ber derî ye. Desthilatdarîya İslâmîya Şîre, êdî di nav qeyrana sîyasî û aborî de, li cîhanê terora İslâmîya sîyasî didomîne û tevaya hêzîn demokratik yê cîhanê, daye hember xwe. Bi darvekirin, asîmîlekîrin, koçberkîrinê ve dixwaze miletê Kurd û pêkhateyên Îranî bêdeng bikin. Lê berbanga dawîya jîyana rejîma İslâmî ya dîktator û hov xuya dike. Ji bo bikaranîna vê derfetê pêwîst e ku tevgera Rojhelatê Kurdistanê xwe amade bike.

Kurd bi, derfetên navxweyî tenê nikarin welatekî serbixwe, miletékî azad û civatek demokratik ava bikin. Ji bo bidestxistina van armancêن pîroz alîkarîya derve bîvê nevî ye. Lê alîkarîya derve jî divê bi hevkarîya navxweyî û yekîtiyek neteweyî lihevkiî be. Em hêvîdarin ku Kurd van derfetan ji dest bernedin û bi karesetên nu ve rûbirû nemînin.

Rêberên Komara Kurdistanê, bi tecrûbeyen xwe, rêberên miletê me ne. Em minetarêne pêşewa Qazî Muhammed û Serokê nemir Mustefa Barzanî ne. Ruhê wan şad bin. Serşorî û rûreşî para dagîrkeran be.

Bijî hevkarî û alîkarîya neteweyî, bijî Kurd û Kurdistan!

**Tahir Silêman**

## "Deskeftiyên Kurdistanê ji berhema xebata Barzaniyê Nemir in"

Îro 120 saliya jidayîkbûna Barzaniyê Nemir bavê ruhanî yê neteweya Kurd e, Pêşmergeyên



herdu şoreşen Îlon û Gulanê jî dibêjin, pêwîst e û erk e jî ku hemû Kurdekkî li ser rîbaza pîroz a Barzaniyê Nemir berdewam be ji bo ku Kurd bîghen hemû mafêñ xwe, ji ber ku ew destkeftên niha berhema xebata Barzaniyê Nemir in.

Pêşmergeyê herdu şoreşen Îlon û Gulanê Sidîq Goran ji malpera fermî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê KDP.info re ragihand: "Îro 120 sal bi ser jidayîkbûna Barzaniyê Nemir bavê ruhî yê neteweya Kurd derbas dibe, ku rojekî geş e ji bo Başûrê Kurdistanê. Ji bo herçar parçeyên Kurdistanê rojekî geş e, ji ber vê yekî divê em hemû li ser rî û rîbaza pîroz a Barzaniyê Nemir berdewam bin û em xizmeta vê rîbaza bîkin, heya ku em bigîhin hemû daxwaz û mafêñ xwe yên ji ber ku Barzanî dibistanek bû ji bo hemû parçeyên Kurdistanê."

Sidîq Goran wiha got: "Barzaniyê Nemir serkirdeyekî netewî û niştimanperwer bû û ti cudadî nedikirin, xwe pêşmerge dihesiband û li kîleka Pêşmerge xebat dikir, jiyanâ wî jî ji ya

Pêşmergeyeyan cuda nebû û hertim xizmeta gelê Kurd dikir. Ez bi xwe jî gelek caran pê re rûniştime, li Nexde û li Kerec û li Qesrê. Gelekî vekirî bû û herdem em şîret dikirin û digot li ser xebatê ji bo mafêñ gelê Kurd berdewam bin. Niha jî mezintirîn destkeft ji bo gelê Kurd bi dest hatîye peymana 11ê Adara 1970ê ye ku ez endamê rîexistina partiyê bûm û ez 23 salî bûm, lewma ew peymân baş tê bîra min."

Wî pêşmergeyê dêrîn wiha got: "Divê em hemû li ser vê rî û rîbaza pîroz berdewam bin û helbet destkeftên me ji berhema xebat û têkoşîna Barzaniyê Nemir in, lewra niha bêyî Serok Barzanî û vê rîbaza dê çareserkirina kîşeyan zehmet be, ji ber wê jî pêwîstiya me bi vê rîbaza her heye ji bo ku em hemû mafêñ gelê Kurd bidest bînîn."

Ji aliye xwe ve, pêşmergeyê herdu şoreşen Îlon û Gulanê Ebdulqadir Mihemed Mensûr ji malpera fermî ya Partiya Demokrata Kurdistanê KDP.info re ragihand: "Em hîn li ser rîbaza pîroz a Barzaniyê Nemir in. Erkê me ye ku em wek Barzanî ligel hejar, cotkar, karker û hemû çînîn din bin. Divê em hertim pêbendî vê rîbaza bin, ji ber ku xebata Barzanî hertim ji bo bidestxistina mafêñ gelê Kurd bûye."

Wî pêşmergeyê dêrîn wiha got: "Destkeftên niha ji berhema têkoşîna Barzaniyê nemir in, ji ber wê jî erkê me ye ku em heman rî û rîbaza bişopînin da ku destkeftên zêdetir ji bo gelê Kurd bidest bixin, ji ber ku wê demê Qazî Mihemed ji Barzaniyê nemir re gotibû ezê bêm bidarvekirin û Ala Kurdisatanê da Barzaniyê Nemir. Barzaniyê Nemir yê hemû perçeyên Kurdistanê bû, ne tenê Başûrê Kurdistanê." Ebdulqadir Mihemed Mensûr wiha got: "Em besdarî hemû şoreşen bûne û şoreşen bi serokatiya Barzaniyê Nemir hemû ji bo bidestxistina mafêñ gelê Kurd bûne û piraniya destkeftan bi desten nemir Barzanî hatine bidestxistin." **KDP.info**

## Qubad Talebanî: Pişka Herêmê tevlî nekokiyên siyasî nekin

Cîgirê Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Qubad Talebanî tekez kir ku stratejiya me ew e ku xizmetguzariyê ji hinardekirina enerjiyê re

"Divê em ji vê derfetê sôd werbigirin ji bo hinartina petrol û gazê li Êraqê. Di vê mijarê de bi stratejiyê nû pêdiviya me bi geşepêdana zêdetir heye da ku

kir ku em giringiyê nadîn kî petrolê difroş, lê divê em bizanîn ka çawa petrolê difroşin û dahata wê li ku diçe, mebesta min zelalbûna xerc û dahatê ye û em piştgiriya xwe radîgînîn bo rîkeftina Herêm û Bexdayê li ser pirsa petrolê, ji ber ku SOMO kompanyayeke berpirsê hinartina petrola Herêma Kurdistanê ye.

Derbarê pirsa mîhvaneke derbarê hinardekirin û dahata petrola herêm de jî, Qubad Talebanî got: Ez venasîrim ku li Herêma Kurdistanê xwepêşandan li ser pirsa neftê têñ kîrin, mafê hemwelatiyên herêm heye ku bizanîn çawa naft tê frotin Got jî: "Herêma Kurdistanê bi salan bûdce nîne, lê bûdce pişta şefafiyetê di dahat û xercîyan de ye."

Qubad Talebanî li ser pirsa mîhvaneke din derbarê pişka herêm de bûdceya Êraqê de got: "Em piştrevaniya projeyasa bûdceyê dikin û em dixwazin hemû maf û darayîyen Herêma Kurdistanê di bûdceya Êraqê de bêñ parastin û divê pişka ku tê herêm bi nakokiyên siyasî re neyê tevlihevkirin û aliye kîtenê ye Dahatên herêm yekdestdar û wek ceza li dijî herêmeke diyarkirî bikar tînin, berovajî, em dixwazin hemû navçeyên Herêma Kurdistanê bê cuðahî ji pişka herêm sôd werbigirin."

Qubad Talebanî di wê dîdarê de got: "Me cendîn caran di hevpeyînan de tekez



pêşkêşî welatiyan bikin û em naxwazin pişka herêmê ji bûd-ceya ku jî Êraqê tê, bi nakokiyên siyasî re têkel bibe.

Dibêje "Li ser dosyaya petrolê li Herêma Kurdistanê û çawaniya firotina wê û dahata wê xwepêşandan têñ kîrin û mafê welatiyan heye ku hûrgiliyê wê pîrsê bizanibin.

Qubad Talebanî îro Çarsemê di çarçoveya beş-dariya di Dîdara Êraqî ya ji bo asayîş û geşepêdanê de li Bexdayê ragihand, pêwîstiya Êraq û Herêma Kurdistanê bi hinartina petrol û gazê heye û pêwîstiya me bi qanûna gazê heye û berî hinardekirinê, divê em li ser dabînkirina hew-cedariyê herêmî bifikirin û vê enerjiyê bi awayekî bikar bînîn.

em di destpêkê de xizmet-guzariyê ji welatiyên xwe re pêşkêş bikin bi awayekî ku dahata enerjiyê ji welatiyan re vegere. Lî belê em dizanîn ku pirsa enerjiyê ne pirsgirêkî e ku di rojekê de were çareser kîrin, lî em ji paşeroja xwe geşbîn in."

Qubad Talebanî derbarê helwesta aliyeñ siyasî li ser pirsa neft û gazê de amaje bi wê yekî jî kir: "Pêwîste aliyeñ siyasî xwedî niyetek baş û rast bin û di warê hinartina petrol û gazê de hevkar bin, ku ev yek dikare roleke girîng di bûdceyê bilîze û li ser pêşnûmeya qanûna bûdceyê li hev bikin."

Qubad Talebanî di wê dîdarê de got: "Me cendîn caran di hevpeyînan de tekez

weran de ji pêwîstiyeke wiha heye ku kurd dê şanazîyê pê bikin. Lî jî ber cuðabûna rewşa civakî û kulturî, ev yek ji bo hemû parçeyan nabe."

## Nêçîrvan Barzanî serdana Bexdayê dike



Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî serdana Bexdayê dike û ligel Serokwezîrê Iraqê dicive.

Li gorî zanyariyan, Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ji bo besdarî pan-elekê derbarê Herêma Kurdistanê de bibe, îro 4ê

Gulana 2023an serdana Bexdayê dike.

Her wiha Nêçîrvan Barzanî li Bexdayê dê ligel Serokwezîrê Iraqê Mihemed Shiya Sûdanî jî bicive û rewşa Iraq û navçeyê û pêwendiyê Hewlêr û Bexdayê gotûbêj bike.

**Nerîna Azad**

## Ebdurehman Kurt: Serxwebûna Kurdistanê ji bo hemû kurdan giring e

Endamê Encûmena Rêve-beriya AK Partiyê Ebdurehman Kurt dibêje, ew serxwebûna

giring e. Ji bo ku kurd xwe bi mîletêñ din yên cîhanê re wekhev bibînîn û di gelek



Başûrê Kurdistanê girîng dibînîn. Derbarê PKKÊ de jî got, tişte PKKÊ bi şerê pêncî salî nekarî bidest bixe, me bi rîyên demokratik ji kurdan pêk anîye.

Parlamente û endamê Encûmena Rêve-beriya AK Partiyê Ebdurehman Kurt di dema besdarîya de bultena Kurdistan24 de da xuyakirin, ew serxwebûna Başûrê Kurdistanê girîng dibînîn, lê vê yekî jî b hemû perçeyan nabe.

Ebdurehman Kurt got: "Ji bo fermîkirina hebûna hemû kurdan di asta navdewletî de, damezrandina Kurdistan serbixwe ya Êraqê, ez girîng dibînîm. Di asta navdewletî de fermîbûneke wiha jî bo bicîhbûna hestê neteweyî yên kurdan

Ebdurreham Kurt dibêje jî, tişte PKKÊ bi şerê pêncî salî nekarî bidest bixe, di dema AK Partiyê de û bi rîyên demokratik ji bo kurdan hatine bicîhkîrin.

Ebdurreham Kurt da xuyakirin jî, "Berê pirsa sereke ya kurdan li Tirkîyeyê, pirsa qebûlkirina hebûna hemû kurdan nedihat qebûlkirin, bi AK Partiyê re pirsa hebûna kurdan nemaye, pirsa wekheviya wan destpê kirîye. Divê êdî em li ser qonaxêñ wekheviye biaxivin. Ev jî bi siyaseta sîvîl dibe." **Nerîna Azad**

## Casûsê Sovyetê Sûdaplatov: "Barzanî siyasetvanevê jêhatî û qumandarekî bi tecrube bû"


Ev nivîsa jêrîn ji pirtûka Pavel Anatolîyeviç Sûdaplatov a ku bi zimanê Rûsî, di bin navê. Ev nivîsa jêrîn ji pirtûka Pavel Anatolîyeviç Sûdaplatov a ku bi zimanê Rûsî, di bin navê "îstixbarat û Kremlîn" hatiye wergerandin. Pirtûk sala 1997 de hatîye çapkirin, di pirtûke de Sûdaplatov behsa gelek tişte hundur û navnetewî é heta nûha bi dizibûn dike; wek problemen Ukrayna, Valenberg, Troçkî û geleken din. Sûdoplatov her weha behsa Melle Mustefa Barzani dike dema ku ew hatîbû Yekîtiya Sovyet. Ew qismé ku behsa Barzani dike, ji rûpela 308-314'a min ji Rusi wergerandiye Kurdi. Berya ew wefat bike me hev nas kir behsa hinek tiştên Barzanî dikir ku di pirtûkê de nîne. Min li vir behsa wan tiştên di sohbeta mede derbas bûne lê nekirie. Bes li vir besê li ser Barzanî ên di pirtûkê de hatîye wergerandin.

Leonid Şabaşkin ku serokê îstixbaratê a derve KGB'e bû, Pavel Anatolîyeviç Sûdaplatov weha dide nasandin: "Casusa Yekîtiya Sovyetê yê heri mezin bûye. Di sala 1907 li bajarâ Melîtopol hatîye dînye, Di îstixbarata Yekîtiya Sovyet de ji sala 1921 hetâ sala 1953'an, serhev 32 sal xebitîye. Di sala 1951 de bûye wekîlî serok qismé derive é NKVD (Komîta Gel a Karê Hundir). Her weha bûye serokê qismé casustîye é NKVD-NKGB. Piştî seré cîhané é duemîn bûye serokê qismé teybetî é Wezareta Ewlekarî. 15 sala di hepsa Sovyetê de mayi, di sala 1992 de şeref û itibara wî bi şunde dané, heger di istixbarat de efsane hebûna, Sûdaplatov wé bîba qehremaneki wan." Di sala 1946 an 1947 de hêzên Kurda yên çekdar di bin serokatîya Melle Mustefa Barzani de bi ordîya Şah re ketin şer û ew mecbur man ji alîye hudûde me ye Îrane de derbas bûn hatin nav Azerbeycane. Kurde kû li Iraq, Îrane û Türkiye dîjîn tu zulm nema ku ne kişandin. Her weha di salen 1939-1941 de dema di serokatiya Tehrane de tesîra Almanya xurt dibû, berpîrsyare hukûmeta Îngiliz ewen bi Kurdanre dilîstin, pişti ordiya Îngiliz û Sovyetê derbasi Îranê bû dev ji Kurdan berdan.

Hezen Barzanî en çekdar dema ku hudud derbas kirin ku dor du hezar çekdar hewqas ji malbata wan hebûn, hukmê Sovyetî destpeke ew girtin û xistin kampeke, di sala 1947 de Abakûmov (Wezire Emni. wer) emir da min ku ez bi Barzanî re tekîlî deynim û pêşniyar bikim ku, Barzani û yen pêre hatine, penaberan siyasi ne û wan li Ozbekistane günde dora Taşkente bi cîh bikim. Ez bi Barzanî re bi nave Matveyev, wek Wekile Mudûre Giştî TASS'ê (Ajansa Telegrafe ya Yekîtiya Sovyet, wer) û berpîrsyare hukûmeta Sovyetê hatim naskirin. Di jiyanâ xwe de bi rasti cara yekemin bû ku ez bi Axayekî bi meerifetre bûm nas. Her weha qenaetek bi min re çebu, ku Barzanî siyasetvanevê jehatî û qumandarekî eskerî bi tecrûbeye. Wi ji min re got, di sedsala dawî de Kurda heyşte caran serhildan li dîjî Fansa, Iraqîya, Turka û Îngilîza kirine û betîr şest carî ji Rûsa alîkarî xwestine û wek lazim e alîkarî wergirtne. Li gor peyve wî ji alîye wan de pir tebiiye ku di dema ji wan re zehmet e, wexte hukûmeta Irani Cumhûriyeta Kürdî ji orte radike alîkarîye ji me bixwazin.

Berî van weqîtan, seroken serhildana Kurde Îrane ketin feqa (xefka) Şah: Ew hatin dewet kirin bo Tehrane ji bo guft û go; le li wir ew girtin û dardekin. Bes Barzanî filî. Dema Şah Barzanî dewetî guft û go kir, wî bersiv da, ku ewe bi wî şertî be, heger Şah hinek kes ji malbata xwe wek rehin bişîne meqere wî. Dema hazırlîya guft û goya bi Şah re dibû, Barzani bêtîr hêze xwe bi alîye başûrê Îrane nezî hudûde Sovyetê de bir. Ji alîye me de, menfete siyaseta me dixwest ku, em Kurda ji bo tesîra Îngilîz û Emerîkiyan, ku li ser welaten Rojhilata Navîn a ku li ser hudûde Yekîtiya Sovyetê bû kem bikin bi kar bînin. Min ji Barzanî re da diyarkirin ku, terefê Sovyetî qebul dike ku,

Barzani û hinek amirhêzên wî di. dibistana eskeri û akademîyen me de xwendinek xas bikin. Her weha min bawerî daye ku, bi cih kirina wan a li Asya Navîn weqîî ye, ku heta



şertîn vegera Kurdistanê çebibin. Abakûmov ji min re qedexe kir, ku ez naveroka guft û goyên bi Barzanî re, bi teybet razî bûna Stalîn a ku ımkân da ku amirhêzên Kurda dikarin di xwendegêh me yêñ eskeri bixwînin, ji seroké partiya komunist Azerbaycanê Bagirov re bêjîm. Ji ber kû Bagirov dixwest Barzanî ji bo tevîhevîyê (bê istiqrâr) li Azerbeycana Îranê çê bike bi kar bîne. Bes Mosko dihesiband ku Barzanî dikare rolek giringtir bileyze, wek wergerandina hukmê Iraqê ku di bin tesîra Îngilîza de bû. Dervi wê. tiştî muhîmtir, bi alîkarîya Kurdan em dikarin demek dirîj bîrén petrola Iraqî (musilé) xera bikin a ku ji bo hêzén Îngiliz û Amerîka li rojhilata Navîn û li behra sipî ku wê demê roleke girîng dilîst. Piştî guft û go bi Barzanî re, ez bi teyare hatim Taşkente, min ji bo hatina Barzanî infomasyon da seroken Usbekistane. Piştî vegerîyam Mosko.

Barzanî û müfreza wî ya be çek tev malbate wan cûn Özbekistan. Piştî penc salan, di adara 1952, ez cûm Özbekistan li nezî Taşkente, ji bo ku çareserkirina problemen derketibûn ez û Barzanî hevdu bibinin. Barzanî ji sekna bê kar (bê hevi) û ji tekîlîyen hukûmeta Ozbekîne ne razî bû. Wi gi-handibû Stalîn, ku alîkarîye dixwaze û xwestibu sozê bere dabûne bînin cî. Wî dixwest ku mufrezîn Kurda çekdar çebikin. Barzani dixwest tesîra wi li ser terefđaren wî kêm nebe, ewen ku li kolxoze dora Taşkente belav kirine her weha kanibe wan kontrol bike. Rasthatina min bi Barzanî re li havingeha hukûmetê çebû. Tercumanê min Zamskov, serbazeki eskerî bû, ew ji wek Barzani bi Îngilîzî dipeyi. Barzanî ji min re digot ku, çawa Emerîkî û Îngilîzî dixwestin wî bikin tere-fe xwe, ji bo zore bidin hukûmetîn Iraq, Îran û Turkî. Bi emre Wezîrî Emni û nuh Îgnatev min plan çêkir ku, ji Kurda mufrezak eskerî teybetî ku ji hezar û pencsed kesî pêk bê ava bike, ji bo emelîyaten eskerî li Rojhilata Navîn. Her weha ji bo vergerandina hukmê Nûri Seid li Bexdade, ewê ku dihat plan kirin, ku we tesîra Îngilîza li hemû Rojhilata Navîn kem bike. Bi alîkarîya Kurda ev plan giha serî di sala 1958 de, dema ku ez di hepsî de bûm. Kurda her weha dibê rolek di teqandina xeta petrole di navbera Iraq, Îran û Sûryê da bîlîsta, heger şer an ji tehdida hucûmekê li ser Yekîtiya Sovyet heba. Barzanî diyar kir ku amadeye bi hukûmeta Sovyetê re îtifaqê ûmza bike, bi şerte garantî û xebata Mosko ji bo avakinna Cumhûriyetek Kürdî; ew cihe ku Barzanî digot Kurd bi hevra dijîn, mintiqâ hudûde bakure Iraq, Îran û Turki bû.

Piştî mm Barzanî guhdar kir, mm bersiv daye, ku ez nikarim biryar li ser îtifaqek weha bidim, ji ber ku di deste min de hewqas berpîrsiyarî nîne (qesta Sûdoplatov ew e ku

qiyyada Sovyetî ya bilind dikare îtifaqek weha munâqeşe bike. wer.) Bes em ne li dij bûn ku hukûmetek Kürdi li surgûne ava bibe. Ewê ku em bi hevre çûbûn ji bo guft û go, xebatkare kîsmê navnetewî é K.M (Komîta Merkezi) ya Partîyê, Mancxa, peşniyar kir ku Partîya Demokrat a Kurdistan bi serokatîya Barzanî bê avakirin. (Qesta Mancxa, rexistîna partîyê li Ozbekistanê be avakrrin. Wer.) Bi fîkra Mancxa, Partîyê we kordinasyona kare hukûmeta Barzanî li tevaya mintiqê ku Kurd le dijin bike û meqerê partîyê li gor peyva Barzanî li kolxoza ku panzdeh kilometra ji Taşkente dure, çebike.

Ez tev ve peyve nebûm, bes bi dîqet min guhdar kir. Dema peyv xelas bû, Barzanî ez dewet kirim rasthatineke bi amirhezê meqerê xwe re. Bi rasthatina me, di ode de sî meriv bi hevre "bi rehetî" rabûn ser xwe. Piştî bi emir giş daktekin ser congâ û bê deng ber bi Barzani ve cûn, ji bo Barzanî rîbide wan qiraxa kinc û sole wi maç bikin. Bê guman, xeyale minê Kurdistana demokratîk heta nuha hebû; ji wê seetê pê ve wenda bûn. Ji min re hate eşkere kirin ku eve ji insiatîvek fîkri ya K.M (Komîta Merkezi, wer) li meydana kevne (Meydana kevn cihe avaye Komîta Merkezi a Partîya Komünîst ya Yekîtiya Sovyetê le bû. wer)

Di nîsana sala 1952 de Barzanî bi malbat û meriv xwere li kolxozek mezin li dora Taşkente bi cih bûn li Mosko qerar hatîbû dayin ku ji bo Kurda navçeyek otonomî bê ava kirin. Kar hat dan Wezareta Emni ku ji bo Kurda perwerda eskeri çebikin, her weha ımkana çêkin ku kanbin têkilî bi Kurdê derve re bikin. Me ceriband ku em zilamên xwe têxin dora Barzanî an hinkâ ji wan bikin zilammen xwe. Bes em bi ser neketin, hemû re ji aliye komîta wanî emni hatibûn girtin. Bes Zemskov, ew e di tekiliyen Kurda de bi tecrûbe bû yak ji amirhezê ku akademîya eskeri dixwend razi kiribû ku bi wan re kar bike, le piştî ku ev amirheza vegerîyabû Taşkente, wenda bû û me nikanbû ew bidîta; em gîhan we qenete ku amirhez bi emre Barzanî hatibû tesfîye kirin. Bi riya pirsa Kurdi min qaidê burokratîyê ji nas kir; ku ji politburo re çawa dokument dihatin hazir kirin. Îgnatev emir da min ku ez li oda Mancxa bîmînim, heta ku razî bûna xwe bînin li ser peşniyarî me di mesela Kurdi de. Îgnatev merivekî her tim nazik û bi terbiye bû, bes wexte min je re got li otela Mosko rasthatina min bi Barzanî re heye, wi bi acîzî ji min re got, ku tu muhîmata pirse fem naki. Emir da min, ku ez rasthatinê texîr bikim, beri her tiştî dibe em razî bûna politburo di mesela Kürdî de bistîn. Ez, Mancxa û Îgnatev em cûn cem Molotov û Vişînskî (Molotov Wezire Derve, Vişînskî Cigire wî bû), ji bo em razîbûna wan li proja çareserkirina pirsa Kürdî bistîn. We çaxê min dît ku Molotov û Vişînskî çuqas îxtîyâr û bê taqet bûne. Bes taqeta wan terê kir ku ji pirojî tiştî ku pê ne razî bûn derxin û ew tiştê ku Wezareta Derve ji bo guft û go û şêwrî dixwaze, ji bo mesela Kurdi karbinin. Her weha wan dixwest ku ev pirs bi peşniyarîya Wezareta Emni li politburo be gengeşikirin, le ne wek peşniyarek müşterek Wezareta Derve û ya me. Dema me peşniyarî Mancxa kir ku em herin cem Lübyanka û ji nûh de şikle dokumente ye tali li ser esase peyva Molotov û Vişînskî ber çav bigrin le bikin. Îgnatev razi bû. Ji vir û pe de tişte ji ali min ne dihatin fem kirin dest pekîrin. Me şiklî tekstê dawî peşniyarî Îgnatev kir; wi razi buna xwe anî. Bes ji bo wezîr ji her weha gelek muhîm bû nama li gel tekstê a ku wê ji endame politburo rebihata şandin. Îgnatev sê cara dokument bi paş de vegerand, ji ber ku naven endamê politburo, ewê ku lazim bû dokumenta me hazir kirîye, wekî ji wan re bi hata şandin. Ne wek lazim bû hatibû lêkirin. Heta wî ji Mancxa pîrsî lazim e nav li gor elfabê bê lêkirin an pêsi navê endamê politburo ûn endamê komisyina tékiliyên derve. Bi vî awayî lazime navê Xrûşov berya navê Bûlganîn bê lêkirin. Bêriya cawa bikin, Lazime ew li peş Melnikov be? Ev nuansa ku min je fem ne dikir, ez pe ecebmayî dimam. Bes Mancxa di hazır kirina dokumenta de yekî jehatî bû, di vî warî de wi re li ber Îgnatev dixist. Ji bo wejîna ku dokument li deqtillo dixist eceb ma bû: Ji bo ci dokument ji nuh

de be çapki-rin, tevi dervî guhertina naven endame K.M (Komîta Merkezi) û hukumetî nefsa dokumente te çapkirin..

Di bihara sala 1953 de tişteki eceb bi min re çebû, min qayide disiplîna eskerî xerakir. Barzanî dihat dersa akademîya eskerî, ewa ku min bi xwe le dixwend. Careke wî ez bi kince general dîtim. Bê ku mirov his bike, wi çav ji min re şikand û bi rîya tercumanê xwe ve, ku letinanteke xort bû, ji mim re got:

Ez geleki kefkeşim bi têkîlyê li gel berpîrsyare hukûmeta Sovyet ê ku xwedîyê rutba eskerî ya bilind e. Min, ji alîyê xwede, bersîva wî bi serketina fîrbûna disiplîna eskerî da. Cara dawî berî girtina xwe min Barzanî li ser riya Gorkî dit. Ez bi kince eskerî bûm. Wi ez dîtim û min jê derxist ku dixwaze bê cem min. Ji rewşa xwe ya wê demê min hesiband ku rasthatina me wê bê mene be û min weha kir ku wek ez le hay nebûme, min lezand û di nav xelke de wenda bûm.

Barzanî gelek bi aqîl bû. Wî fem dikir ku peşeroja Kurda bi nakokîyê navbera dewletê mezin ve giredayıye; bi taybetî ewen ku menfetî wan li Rojhilata Navîn heye. Em dev ji nerînê bere berdin, tu dînerî, dewletê me-zin xebat nakin ku pirsa Kürdî bi awaki adil safi bikin. Qedera Kürdistanê, wek di menfiye Kurda de tu carî ne li Kremînê, her weha ne li Londonê û ne li Washington nehatîye li nerin. Menfetî welatê rojava û e me tene tiştek bû; bele derde me ew bû ku emê çawa bîghîjîn bîrén petrolê yê Rojhilata Navîn. Ev cuqas bê ar û be edebî ye. Piştî pirsa Kurda sparte Sûsluv, wi soz dan Barzanî ku ew hemû alîkarîyê ji bo otonomî bi Kurda re bikin, ji bo bikarîbi alîkarîya Kurda hukmê Nurî Seid li Iraqê wergerîn. Emerîkiya ji ji alîyê xwe weha soz dan Barzanî, ji bo ku bikarîbi hukmê li Iraqê ku bi Îngilîza ve giredayıye wergerîn û zilamî xwe deyînî cihe wî, bes di dema heri zehmet de wana siyaseta xwe guhart bi Îngilîza re li hev kirin, yani wan, bi qedera Kurda cuqas karibûn hewqas listin. Di salen 40-50 de armansa me ew bû ku em tevgera Kürdî di nakokîye di navbera me û welatê rojava de, di "şerî sar" de bi kar bînin. Fîkra avakîrina cumhûriyeta Kürdî ımkân dida me ku em siyaseta teesira Îngiliz û Emerîkiya li Rojhilata Navîn kem bikin bi meşînin, bes siyaseta kêmkirina tesira Îngiliz û Emerîkiya li ve mintiqê ji tevaya Kurda re pir ferq nedikir. Heta dawîya sala 50 li Rojhilata Navîn hevalbendê me tenê Kurda bûn. Piştî bi îngilabek eskerî (bi alîkarîya me) rejîma Nurî Seid hat wergerandin û me gelek hevalen wek Iraq, Sûrî û Misir bi dest xist, li gor menfetî jeopolitîk é Yekîtiya Sovyetê ew ji Kurda muhimtir bûn. Iraq û Sûrî rola esasî di siyaseta me ye Rojhilata Navîn û di nakokî ye me bi welatê rojava re li ve mmîtiqa be istiqrâr de lîstîn. Tragediya Barzanî û a gele wî ew bû ku, di menfeatî Yekîtiya Sovyet û welatê rojava (heta derecak e welaten Ereba û Iran) li Kurda te nerin wek quwetek pe hevdû bitirsin an ji wek kartekê di nakokiye navbera wan û Türkî, Îran û Iraq de bi karbînin. Çareserkirina pirsa Kürdî bi awayekî maqûl we ew be ku, di bin garantîya navnetewî de otonomî bidin Kurda, bira cuqas kêm be ji. Di esas de ne li welatê rojava û ne li welatê Ereba kesek naxwaze, ku petrola Musile di Kürdistanek serbixwe, an di kontrola wê de be.

Di sala 1963 de di navbera me û hukmê Qasim û qewmiyê hatibûn şûna wî nexwesi derket. Ez we çaxê di hepsîde bûm, ji wir min pêşniyara xwe şand ku bi Barzanî re têkevin têkiliya û min bihist, ku ew pêşniyara min hatîye qebulkirin. Ji Kurda re alîkarî û sîleh şandin ji bo ku karibrin axa xwe ji hicûmî ordîya Iraq biparîzin. Bes kare me ye ku em Kurda bikin hevalbendê xwe ye stratejik, ji bo em karibrin teesîrî li ser Problemî Iraqê bikin, bi ser neket.

**Nivîkar: Pavel Anatolîyeviç Sûdaplatov  
Werger ji Rûsî : Alk.đoc. Dr. Ekrem Önen  
ekremonen@hotmail.com**

**Konfidîtsial (Dizi) \***  
**Rojhilata Navîn  
eskere û dizî (Nivê qîrnê XX û destpêka  
qîrnê XXI)**

**Nivîkar: Yevgenî Prîmakov  
Werger ji Rûsî: Dr.Ekrem Önen**

# Jîyan û serhatda Serok Mesûd Mistefa Barzanî

Mesûdê kurê Mela Mistefa Barzanî di 16-ê tebaxa 1946-an de li bajarê

girtiye stûyê xwe.

Piştî ruxandina Şoreşa Îlonê li encama rêkkeitinnameya Cezayirê li navbera Şahê û Hikûmeta Iraqê li sala (1975), bi rênimayıya cenabê Mela Mistefayê Barzanî, Mesûd Barzanî li gel Îdrîs Barzanî birayê wî û jumareyek li hevalên xwe pêkve helsan bi rêtixtina rêzên pêşmerge û damezrandina serkidayeti demkî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê ji bo dakokîkirina li kurd û Kurdistan û di 26-ê gulana 1976-an şoreşa gulan dest pê kiriye. Di sala 1976-an heta 1979-an de

gundê barzaniyan xera kiriye ku gundê birêze, Barzanî pirtûkekî li ser rola dîroka Mistefa Barzanî bavê xwe li Tevgera Neteweya Kurd li jêr navê Barzanî û Tevgera Rizgarîwaziya Kurd ku li sê bergen pêk hatiye nivîsandiye, li gel çendîn gotar û babetên siyâsi ku li rojname û kovarê Kurdistanê hatine belav kirin. Piştî şerê hevpemaniyan dijî bi Iraq, Barzanî hem ahengî bereya kurdistanî kir û serkidayetiya raperîna adara 1991-ê kurdan kir ku bûye hoyâ azad kirina beşekî mezinê Kurdistanê Iraqê ji deste rejîma Bexdayê.

Di meha nîsana 1991-ê de gûftûgo li gel Bexdayê dest pê kir û Barzanî ji bo çendîn mehan serokayetiya şanda kurdî kir ku li hemû hizbêne bereya kurdistanî pêk hatibûn. Li gûftugoyan bi hîc encamek negîhiştin bi sedema redkirina daxwaziyêne kurd ku birîti bûn li otonomî herêmeyetî û demokratîzekirina ji alyîn Iraqê ve. Her wiha li kongreya 12-ê ya Partiya Demokrat a Kurdistanê di sala

1999-an de Mesûd Barzanî serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê careke din hatiye hilbijartin. Mesûd Barzanî li salên nohtan û heta weku ji navçûna rejîma Bees, beşdarî çendîn kongre û civînên navdewletî kiriye. Wekî civînên Washington li sala 1992-an û paşê li 1993-an û likongreya Selahedîn a 1992-an û kongreya Londonê ya îlona 2002-an û kongreya Selahedîn a şubata 2003-an. Barzanî roleke xwe yê serekî li serceme pêşhatiyêni siyasiye Iraq'a nû da hebûye, paşê li damezrandina Encûmena hukimrana Iraqê di

cotmeha 2005-an de û papayê Vatikanê di 14-ê mijdara 2005-an de û Silvio Berlusconiserokwezîrê Italyayê di 13-ê mijdara 2005-an de û Abdullah keyê Erebistana Siyûdî di 13-ê adara 2007-an de û Abdullah keyê Urdunê di 19-ê adara 2007-an de. Wekî serokê herêmê ji bo geşkirina hevpemaniyi li nav hêzîn siyasiyêne Kurdistanê çend organekî damezrandiye û li herêmê proseya biryardanê baştir kirî:

- Li roja 22-ê kanûna 2007-an Encûmena Serokayetiya Kurdistanê hate damezrandin ku têda serokê herêmê serpereştiya civînan dike, û cîgirê serokê herêmê Kosret Resul li gel serokê Parlementa Kurdistanê û serokê Hikûmeta Kurdistanê û cîgirê wan û serokê



Mehabadê li Kurdistanâ Iranê, li ber sîhê alaya Kurdistanê û li roja damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê ji dayik bûye. Li serdema temena kurt ya Komara Kurdistanê li Mehabadê ku yekemîn giyana serbixwe ya kurdî bûye.

Piştî rûxana Komara Kurdistanê di sala 1947-an de, binemaleya Mesud Barzanî li gel komek li pêşmergeyan û binemala wan naçar bûn vegerin Kurdistanâ Iraqê û paşê li alyî rejîma Iraqê ve hemû bo bajarêne xwarê Iraq hatin dûrxistin, bi taybetî Bexda û Besre, lê belê Mela Mistefa Barzanî, bavê Mesud Barzanî, rêberê şoreşa kurd li gel hevalên xwe berbi alyî. Yekîtiya Sovyetê bi rêketin û heta sala 1958-an li wir man. Mesûd Barzanî bi sedema hokara siyâsi û peywendiya bi şoreşa Îlonê xwendina navendî temam nekir û Bexdayê bi cîh hişt û li temena

Mesûd Barzanî li gel bavê xwe li Amerikayê jiyaye û piştî rûxana rejîma Şahê Iranê, vegeriyaye Iran û heta tertîbata hatina bavê xwe, bo Iran bike lê

belê wê roja ku Barzanî 1-ê adara 1979-an gihişte Iran, bavê wî li Washington koça dawî kir. Li meha mijdara 1979-an, li kongreya nehem a Partiya Demokrat a Kurdistanê bi awayekî demokrasiyane

Barzanî Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê hate hilbijartin. Rola her yek li Mesûd Barzanî û Îdrîs Barzanî yê birayê wî, gelek berbiçav bûye di salên 1980-ê, heta wekî 1987-an de li damezrandina çendîn komeleyen siyasi li Iraq û bi taybetî ku, bereyên kurdistanî li çendîn rêtixtin û hizbêne kurdistanî damezrand.

Barzanî û ji malbata xwe gelek qurbanî li ser kîşeyâ kurd daye û li dawîya li dayik bûnê heta 12 sal bavê xwe nedîtiye, ku ew li dûrî welat li Yekîtiya Sovyetê dijîya. Sîxurêne rejîm sê birayê Barzanî teror kirine 32 kes le endamên malbata wî li gel wan 8000 Barzanî bûn ku ji alyî rejîma Bees ve di sala 1983-an de hatin enfalkirin. Mesûd Barzanî xwedî çendîn hewldanên terorê bûye bi

31-ê tîrmeha 2003-an, ku têda bûye endam û dawîye jî bûye serokê encûmenê.

Di 12-ê hezîrana 2005-an de Mesûd Barzanî wekî yekemîn serokê herêmâ Kurdistanê ji alyî Encûmena Nîştimanî




16 salî di sala 1962-an de çek hilgirtye û çûye rêzê pêşmergeye Kurdistanê û roleke wî berbiçav hebûye. Li şoreşa kurd ku di 11-ê îlona sala 1961-ê de rîberiya Mela Mistefa Barzanî destpêkir û heta sala 1975-an berdewam bû. Li jêr rênimayı û piştîriya bavê xwe têkilîya xebata siyâsi bûye. Barzanî jiyana xor-taniya xwe terxan kiriye ji bo wan armancênu ku Partiya Demokrat a Kurdistanê bîlinde kiriye. Di sala 1961-ê de, demokrasî ji bo Iraqê û Otonomî û paşê Federalîzm ji bo Kurdistanê li çarçewaya Iraqueke demokratîk da, rîzdar xebatekî mezin ji bo vê çareseriya rasteqîne kiriye.

Barzanî li temena bîst salî da bi awayekî rîk û pêk têkilî karûbarê siyâsi bûye û di sala 1970-ê de beşdarî wê tîma kurdî bûye ku gûftûgoyê li gel Hikûmeta Iraqê, li ser rîkeftina otonomî kiriye. Di sala 1971-ê de li dema sazkirina kongreya heşta Partiya Demokrat a Kurdistanê bi sîfeta endamê komîteya navendî ya partiyê hatiye hilbijartin û paşê bûye endamê yedegê mekteba siyâsi û erkê berpirsiya dezgeha emnî



taybetî hewlîn terorkirina li Viyana pay-texta Nemsayê di 8-ê çileya 1979-an. Rejîmê Iraq yek li dawîya yekê (16) çar-

wekî serokê herêmâ Kurdistanê hate hilbijartin û li roja 20-ê tebaxa 2009-an li beramber Parlementa Kurdistanê sonda



yasayî xwar. Wekî serokê herêmê, li çendîn welatan bi seredanê fermî kiriye û çendîn serokê welat û serokwezîrê van welatan dîtiye, li encama van hevdîtinan de li gel serok George W. Bushserokê Amerikayê di 25-ê cotmeha 2005-an de û Tony Blair serokwezîrê Britanya di 31-ê cotmeha 2005-an de û papayê Vatikanê di 14-ê mijdara 2005-an de û Silvio Berlusconiserokwezîrê Italyayê di 13-ê mijdara 2005-an de û Abdullah keyê Erebistana Siyûdî di 13-ê adara 2007-an de û Abdullah keyê Urdunê di 19-ê adara 2007-an de. Wekî serokê herêmê ji bo geşkirina hevpemaniyi li nav hêzîn siyasiyêne Kurdistanê çend organekî damezrandiye û li herêmê proseya biryardanê baştir kirî:

- Li roja 22-ê kanûna 2007-an Encûmena Serokayetiya Kurdistanê hate damezrandin ku têda serokê herêmê serpereştiya civînan dike, û cîgirê serokê herêmê Kosret Resul li gel serokê Parlementa Kurdistanê û serokê Hikûmeta Kurdistanê û cîgirê wan û serokê

**Amadekar: Tahir Silêman**

# Ji Quştepe heta Enfalê û tevkujiyên bêrawestan!

Pêşkêşî du hevalên min:  
Kovan û Maaf Barzanî

Dîmenê Yekemîn

Tîrmeh li Kurdistanê bi piraniya rojêne xwe yên germ re dem û saetên reş an jî baştire bêjim kêm rojêne xweş bi bîra me tîne!

Di rûyê wê yê tije êş, di çavêne wê yên tije tirs û di lerzîna destêne wê yên mandî de dîsa jî hêzek heye, lê sirr û gotinêne hê nebihîstî jî hene. Ew li min dinêre û bi gotineke watedar sirra mayîna xwe a li ser pêyan aşkera dike: "Hêvî haveynê jiyanâ min bûye kurê min..."

Navê wê "Xemê. B" ye û naxwaze kes wê binase. Belki niha nebûye 60 salî lê weke pîre-jineke 80 salî dixuyê û ev jî dide diyarkirin ku ci çêz û tam ji salen bihara jiyanâ xwe nekêşane. Serbihûriya wê romanek rastin a nenivîsandî ye.

Xemê gotin û peyvîn xwe wisa xweşik beyan dike ku destanbêjîn sedsalen berê bi bîra mirov tîne. Carna li kurê xwe dinêre û wiha dibêje: "Dema wê rojê sibê zû êrişî kempa me kirin em hemû razayî bûn. Ji bo peydakirina pariyekî nanê jiyanê, malxê min, du tî û xezûrê min yê 75 salî diçûne bajarê Hewlîrê. Karkerî û carnâ jî di nava erde gundiyan de dixebitîn. Hemû deh meh bû ku ez hatibûm wê malê û 19 salî bûm. Zikê min sê mehî bû. Kovan 6 mehan piştî wê roja tehil hate dinê...."

Li kurê xwe dinêre û bi qasî ku dikare naxwaze li cem bûk, nevî û kurê xwe bigirî, lê dema li wêneyê pişta serê xwe yê bi dîwar ve daliqî dinihêre, hêşirêne çavan weke baranê dibarin, nikare xwe bigire. Dema ew bi hesreteke kûr behsa hevjinê xwe dike, li ser evîneke nîvcûmayî jî diaxive: "Niha em li Barzan bûn ku me ji hev hez dikir. Ew 4 salan ji min mezintir bû. Du sala kêşa heya yên me razî bûn ku min bidenê, lê piştî zewacê jî em tenê deh mehan bi hev re man. Gelek xweziyên me hebûn û roja ku zanî ez pêgiran(hemle) me wiha got:" Binihêre Xemê eger kur bû navê wî Dilşad e, bes eger keç bû navê wê Gulhat e..."

Dîsa li kurê xwe dinihêre û bi van gotinêne tije axîn re em jî hemû li wan dinihêrin û veciniqîneke tije hestên dilsojiyê riha me dadigire. Min jê pîrsî lê navê kurê te Kovan e..."

Belê êdî ew nema ku bi navekî wiha re dilxweş bibe. Min ji ber êş û elemén ku me bi çavê xwe dîtin, navê Kovan danî ser kurê xwe yê paşbab. Ez ji bo xeman hatibûn dinê û navê min jî ji xwe Xemê ye..."

Wê rojê ci qewimî?

Bila kes nebîne, xwedê bi nisbê kesî neke, ya me dît inşelah kes nebîne. Weke wehşan hatin ser serê me. Ber deriyê hemû malan girtin, hinek li derive û du-sê kes jî bi postalen xwe yên pîs ve diketin hûndir. Wê rojê yet kes jî ji

kempê derneketibû. Hemû zilamên nav malan bi zorê ji nav cihan derxistin. Li kêleka jin, zar û dayikan derxistin. Tu

31'ê Tîrmehê bû!

Sibeha roja 31. 07. 1983'an bû.

Cih: Qempa Quştepe li nêzî



dem û wext nedan ku heta kincen xwe jî bikine ber xwe. Li cem Refîq Hizbî(1) û Beesîyan ci merhemet û mirovahî nebû. Weke goran pirdidane ciwan û zilaman. Tiye min ê biçük hê 15 salî bû. Xwe li bersingê diya xwe da û bi dengekî bilind qîriya, lê pişta stûyê wî girtin û bi dûv xwe re kişandin. Tevî hemû qîrîn, hawar û daxwazên ku me ji wan dikirin, çar kesen malê bixwe re birin, wê rojê qîrînê jin û zarikan esman jî tije kiribû..."

We texmîn dikir ku êdî ew venagerin?

Na! Ez heya sala 2003'an jî bi hêviya vegera malxê xwe bûm, lê xwesûya min heya roja mirina xwe wiha digot: "Keça min ew birin û êdî venegeriyan...". Ew bi wê êş û xemê çû, gotin jî rast derketin, ne yên me û ne jî hezaran kesen din..., kes venegerî nav me. Hemû winda kirin. Bûne qurbana şerê Iran û Iraqê, qurbana wan Kurdên ku li aliye din ê sinor bûn û em jî li vira hêşirêne destê Sedam bûn...."

Debara jiyanâ we li pey wê rojê bi ci awayî derbas bû?

Min û xwesûya xwe di nav malen Hewlîriya de weke xûdam kar dikir. Carna roj hebû me sê-çar mal diuguherandin. Wan salan xelkê Hewlîrê gelek qencî li me kirin. Me karê paqijiya malan dikir û êvarê jî vedigerîn mala xwe a kampê ku tim ji aliye istixbaratê ve dihate kontrolkirin. Jiyanâ wan salen nexweş qet û qet ji bîra min naçe, lê dawî bi jiyanâ wan kesan jî hat yên ku hê di bihara jiyanâ me de ew qedera kirin para me..."

Xemê hê jî bi wêneyê hevalê xwe re dijî û carnâ jî pêre xeber dike.

"Hinek caran çend saetan li hemberî wêneyê wî disekinim. Pêre diaxivim. Li ser hêvî û xweziyên ku tev bi avê de çûn. Li ser delalî û salen xweş nexweş yên jiyanê pêre diaxivim, lê ew bersiva daxwaz û pîrsîyaren min nade! Bêdeng e û tenê li min dinêre!. Qet bawer nakim ku ew bejna bilind, çavê zer û kena wî ya xweş careke din nebînim..."

bikin, li ser şerê kafir û mis-

lîmanan nazil bûye.

Bihara sala 2005'an min çîroka Enfalê ji zimanê çend dayikêne kurd(wek şahidîn zindî) li gundê Barzan bihîst ku niha jî dengê wan ê melûl di guhê min de ye. Ew xemgînî û hesretên bêderman, hezaran xewnêne ku dikarîn bibîne rastî, xwezi û daxwazên ku bêbersiv mane, tev bûne qurbana xeyalêne pûc yên mirovî dîn û har yê otorîter. Desthilata otorîter a ku êdî ne navek jê maye û ne malek ji xwedîyên wê re! Beesîyen cînayetkar cûn û winda bûn, lê şûnewarên kîyarên wan yên tije hovîtî dê zû bi zû ji hişê civakê winda nebin.

Piştî tevkujî û wendakirina heşt hezar Barzaniyên qampa Quştepe û deverên din ên başûrê Kurdistanê, bi nêzîkbûna dawîhatina şerê du welatên Iran û Iraqê re li sala 1988'an sed rojê herî reş xwedî nasanevî bûn ku weke Enfal dê qet ji bîra mirovahîyê neçin.

Tevkujiya 182.000 kesen bêsûc!

Ew sal salen qederê bûn, lê roj ji roja berê zêdetir siyaset dewletê a qirêj û tunekirina kurdan ber bi pêşve diçû. Hêzen kurdan yên siyasi jî zêde xwedî iradeyeke ser-

piraniya herêm û gundên Germiyanê

Qunaxa çaremîn : Ji 3'ê heta 8'ê gulana sala 1988'an li herêma Qelay Sîyoke û Şêx Berzînî

Qunaxa pênc, şes û heftemîn: Ji 9'ê gulânê heyta 25'ê tebaxa sala 1988'an li herêmên Dukan heya sinorê Rewandiz berdewam bû ku têda çekên kîmyayî gelek caran hatin bikar anîn.

Qunaxa heştemîn û dawiyê ji: Ji 26'ê Tebaxê heya 6'ê llona sala 1988'an li herêmên Behdînan û çendîn gundê din ku têda çekên kîmyayî jî bi giranî hatin bikar anîn.

100 rojê Enfalê reştirin rojê jiyanâ kurdan têne hesibandin ku niha jî ne ji aliye pisporê kurdan û ne jî ji aliye rêxistinîn mafen mirovan ên navneteweyî ve lêkolîneke berfireh li ser nehatiye çekirin.

Di wan rojê reş de berê cih, gund an jî herêm ji hêla Beesîyan ve dihatin destnîşankirin, piştî gel li cihêkî kom dikirin û di dawiyê da jî ew tev bi hevre diküstün û gelek caran jî ew zindî bi gor dikirin. Bi taybetî jî li dijî gundî û cotayaren kurd ku ji şoreşgeran re weke gola avê jîyanâ bûn, bi dijwarî ketibûn liv û lebateke



bixwe nebûn û mixabin weke "amrazeke rojê" di destê Iranîyan de dihatin bikaranîn. Hinekan jî xwe avêtibûn paşila Beesîyan û wê çaxê jî li benda otomoniya Sedam bûn!. Bi giştî wan salan hêzen siyasi li Kurdistanê derfetên mezîn ji dest dan. Hingî "stratejiyeke hevgirtî" dikarî gelek destkeftên mezîn ji kurdan re bike mal. Di rewşike wiha de kurd ketin ber bayê reş ê Enfalê. Bêguman ger Sedam kesekî şerxwaz û ehmeq nebûya an jî baştire bêjim tenê êrişî ser welatê Kuvêyt nekira, belkî iro li başûrê Kurdistanê rewşike din hebûya. Di wan salen dijwar de heşt qonaxen ku operasyonê nifşukiyê tê de derbas bûn, wiha bûn:

Qonaxa yekemîn: Ji 23'ê sibatê heya destpêka Adara sala 1988an li herêmên di bin desthilatdariya hêzen YNKê da.

Qunaxa duyemîn: 22'ê Adarê heya yekê llona sala 1988an li herêma Qeredaxê

Qunaxa sêyemîn: Ji 7 heta 29'ê nîsana sala 1988'an li

hemû alî. Wan dixwestin ava gola ku masî ji bo jiyanê hewcedarî wê bûn, heya dilopa dawiyê biçikînin. Beesîyen cînayetkar piştî zêdetir ji 1400 salan cewherê wê sûreya Quranê li Kurdistana ku zêdetir ji sedî 95'ê a nifusa wê misilman in, careke din di piratîkê de dan xuyakirin!

Dîmenê duyemîn, sêyemîn û çaremîn jî bila bimîne bo heftiyê din.

(1). Erebê neteweperest, Beesîyen perwerdekirî û dewredîtî ku di parastina dewletê de kar dikirin û sîxûr bûn. Di nav wan gelek kurdên xwefiroş jî hebûn.




Kakşar Oremar

# “Diplomat” qəzetiinin arxivindən

## 1947-ci ildə kürd xalqının qəhrəman oğlu Molla Mustafa Bərzani 504 Peşmərqəsi ilə Azərbaycana pənah gətirmişdir

### Qəhrəman kurd xalqı hər zaman dar gündə Azərbaycan xalqına arxa və dayaq olmuşdur



**Əmrəl Ləhrudi**

Müsahibim 1946-ci ildə Pişəvəri ilə birlikdə Azərbaycana gələn, hazırda ADF-si MK-sinin sədri Əmrəl bəy Ləhruditidir.

-Əmrəl müəllim, xahiş edirik Molla Mustafa Barzani haqqında xatirələrinizi danişasınız.

-Molla Mustafa Barzanının qəhrəmanlığı haqqında, istə o təydi, istərsə də bu təydi çox eşitmışdım. O, bütün döyüslərdən qalib çıxırı, çünkü onun peşmərqələri könüllü ona qoşulmuşdular və hamisi da çalışırdı ki, ondan qabaq döyüş meydانına atılsın. Onların bu cür döyüş taktikası hər zaman düşməni qaçmağa məcbur edirdi. Peşmərqələr ölümü özlərinə şərəf bilirdilər.

SSRİ-nin xəyanətindən sonra Pişəvəri Molla Mustafa Barzanını eştmedi Bakıya gəldi və göldiyi gündən də gəlmeyinə peşman olmuşdu. Geri qayıtmak planı üzərində işleyib partizan hərəkatı başlatmaq istəyirdi. Ona görə Mahabada adam göndərdi. Lakin, gec idi. Molla Mustafa Barzani 1947-ci ildə Təbrizdə olan Sovet konsulxanasına müraciət edir, silahlı mübarizəsinə davam etdirmək üçün məsləhətləşmələr aparır. Səfirin müavini -vitse konsul Nuriyev məsləhət görür ki, iş-işdən keçib, daha silahlı mübarizə vaxtı deyil, bu məsələnin üzərindən keçməyə çalışın. Bu xatirəni mənə konsulxanada Molla Mustafa Barzani ilə görüşən bir yoldaş söylemişdi. Molla Mustafa Barzani çox çətinliklərlə rastlaşmışdı. İran Kürdüstanından İraq Kürdüstanına, İraq Kürdüstanından Türkiye Kürdüstanına, oradan da yenə İran Kürdüstanına keçmiş və Araz çayını keçib Naxçıvana gəlir. Orada onu çox gözəl və səmimi qarışayırlar, yer verirlər. Bir neçə gündən sonra peşmərqələri ilə birləşdə Bakıya gətirirlər. Bir müddət-dən sonra onları Özbəkistana göndərirlər.

Bakıda olarkən, onun dostu Qulam Danişkian Molla Mustafa Barzani haqqında gözəl xatirələr söyləyirdi. Bir xatirəsində o deyirdi:

Bir gün Mir Cəfər Bağırov hamımızı qonaq çağırılmışdı. Molla Mustafa Barzani də həmin qon-

aqlıqda iştirak edirdi. Masaının üstündə hər cür ləziz xörəklər düzülmüşdü. Hami yeməyə başladı, Molla Mustafa Barzani isə əlini yeməyə uzatmadı. Bunu görən Mir Cəfər Bağırov soruşdu ki, bu gözəl xörəklərdən nə üçün yemirsən?

Molla Mustafa Barzani cavab verir ki, peşmərqələrim azıqə sarıdan çətinlik çəkirlər, onların rahathlılığı olmadan mən yemək yeyə bilmərəm, yemək boğazından keçməz.

Qulam Yəhya deyirdi ki, həmin günü bütün azıqələrdən hazırlayıb peşmərqələrə apardılar. Molla Mustafa Barzanının o hərəkətinə görə bütün peşmərqələri geyim-keçimlə də təmin etdilər. Molla Mustafa Barzanının mərdliyi, kişiliyi, qəhrəmanlığı gözümüzün qabağındadır. Öz gördükərimdən başqa Qulam Yəhya da onun haqqında çox əhəmiyyətli xatirələr söyləyirdi.

-Əmrəl müəllim, Qulam Yəhya kim idi?

-Qulam Yəhya Zəncan cəbhəsinin danişkanı idi. 1945-ci ildə Azərbaycan Demokratik Firqəsi MK-nin üzvü idi. Hərbi nazirin müavini sayılırdı. Zəncan cəbhəsinin komandanı, fərmandarı idi. İran qoşunlarında Zülfüqari bandasının dəstələri ilə vuruşurdu, bir addım da geri çəkilmirdi. O da Molla Mustafa Barzani kimi qorxmaz, qəhrəman,

